


Hûmare / Hejmar:1
Serre / Sal: 2015

FANZÎNA WENDEKARANÊ UNÎVERSÎTEYA ÇEWLÎGÎ

Laser

FANZÎNA XWENDEKARÊN ZANÎNGEHA ÇEWLÎGÊ





Qelem Ey!

Ji Weşanên Loryayê Derçû!

Naveroka Laserê

Tirsza Zarokî / Ahmet Subaşı	04
Şarê Ma / Şahap Laçîn	06
Porteqal / Kerem Can	07
Li Ser Dergûşan Çend Bawerîyên Balkêş Yên Folklorîk / Fatma Oktay	08
Qickeka Mi / Berfok Kendal	09
Di Çanda Kevnare De Stêrknasiya Gel / Ahmet Subaşı.....	10
Hevpeyvînek Bi Hasan Çiftci Re / Zübeyir Durmaz	14
Şînenîgarî / Mem Artemêt	19
Kelepora Tariyê / Ejder Êlih	20
Ey Dîlber / Mazlum Şemzînî	22
Semsûr / Kübra Öztürkeri.....	23
Evîna Qijika Belek Û Kewa Gozel / Haşem Tîlkî	24
Tenayîye / Neslîhan Temel	26
Sewta Mirinê / Mem Artemêt	27
Nûr Elî Îlahî (Ostad Elahi) / Hesênê Cindî	28
Kürdistan Kartali Yado / Şukrî Şemzînan	31
Ziwan / Şahap Laçîn	33
Ez Ê Zimên Bikujim! / Tufan Yamaç	34
Çi Pawenî? / W. K. Merdimîn	36
Ber-Bendî / Kerem Can	37
Îşev / Erol Çoban.....	38
Kedkarên Vê Hêjmarê / Kedkaranê Na Humare Xwendekarên Zaningeha Çewlîgê.....	39

Laser

Fanzîna Xwendekarên
Zanîngeha Çewlîgê

Hejmar: 1 Sal: 2015

Koma Laserê

Ahmet Subaşi
Mazlum Özel
Ejder Nart
Haşem Tilki
Hasan Filitoğlu
Fatma Oktay
Şahap Laçın
Şenay Asutay

Wêneyê Bergê

Ji derdora Gola Urmiyeyê
Xalîçeyê Kurdî

Redaksîyon

Ahmet Subaşi

E-mail

kovaralaser@gmail.com

Ji Koma Laserê

Merheba xwînerên delal, bi hejmarê yekem a kovara Laserê ve, em li pêşberî we ne. Dibe ku we navê kovarê û wateya wê meraq kiribe. Di serî de em dixwazim sedema navê kovarê bi kurtasî ji we re rave bikim. Laser an jî lêser peyveke hevpar ya kurmancî û zazakî ye ku tê wateya lehî, sêl, lêser û lêkendê. Em hêvî dikin ku nivîsên wê kovara biçûk û şîrîn wekî lehiyê bi coş û peros biherike û bêsekn û rihet xwe bigihîne deryaya edebiyatê. Helbet ev hewldana laserê bi îdiayeke mezin ve ranabe, tenê keda xwendekarên beşên kurmancî û zazakî yê Zanîngeha Çewlîgê ye ku dixwaze ji xwe re qadeke pratîk û nivîsandinê veke.

Ji navê kovara me laserê jî diyar e ku wê bi kurmancî û zazakî weşana xwe dewam bike. Çimkî kovara me li Çewlîga warê zazayan derdikeve û dixwaze bi nivîsên xwe yê zazakî ve jî rengê xwe weş û war bike. Her wiha hêvîdar in ku hejmarê me ya bê de xwendekarên beşa zazakî û kurmancî wê zêdetir beşdar bibin û vê govenda zimên mil bi mil bigerînin.

Hekê hûn li naveroka kovarê binêrin, hûn ê bibînin ku cûreyên wekî helbest, çîrok, ceribîn, gotar û hwd., dagirtî ye. Nivîsa Hesênê Cindî, derbarê kurdekî gelek navdar "Ostad Îlahî" ango Nûr Elî Îlahî de ye ku wekî îcadkarê tenbûra modern tê zanîn. Herwisa di vê hejmarê de hevpeyvîneke berfireh bi Prof. Dr. Hasan Çiftci re hatiye kirin. Mamoste Hasan Çiftci nika serokê Enstîtuya Zimanên Zindî û serokê Ziman û Edebiyata Rojhilatî ye. Wekî din ev hejmar ji hêla folklorê ve jî nivîseke balkêş ya Fatma Oktay dihewîne. Ahmed Subaşi jî stêrknasiya gel û mîtolojiya di derbarê van stêrkan de nivîseke xweş amade kiriye û navên stêrkan û navên wan yê zanîstî bi tabloyekê ve daye ber hev. Şahap Laçın jî bi zazakiya xweşik seba kovara me du heb helbest şandiye. Mixabin em nikarin li vir qala hemû nivîsan bikin. Loma em spasîyên xwe pêşkêşî hemû kesên kedkar dikin.

Bi hêviya hevdîtineke din, bimînin di nav xêr û xweşiyê de.

Laser

Fanzîna Wendekaranê
Unîversîteya Çewlîgî

Hûmare: 1 Serre: 2015

Koma Laserê

Ahmet Subaşı
Mazlum Özel
Ejder Nart
Haşem Tilki
Hasan Filitoğlu
Fatma Oktay
Şahap Laçın
Şenay Asutay

Resmê Qapaxê

Dormaleyê Urmîye ra
yew cacima kurdî

Redaksiyon

Ahmet Subaşı


E-mail

kovaralasere@gmail.com

Koma Laserê Ra

Merhaba şima rê wendekarê erjîyayê. Her kovara newe wexto ke vejîyena merdim zaf keyfweş beno. Na kovare bi zazakî û kurmançî ya, hîna xeylê xasek a. Nê çend serrî yo ke nuştayê ma giryanê xo qedexe ra biney xelisnayo. No yasax, ma hema zaf weş zanê ke ge-ge nimite û ra-ryan zî eşkera yew hewa de dewam kenê. Ma heta ewro senî ver ra nê asîmilasîyonî xo pawito, ganî ewro ra pey zî ma xo hema zaf pêt bipawe. Ziwanê ma roj bi roj xebata edebîyatî de cayê xo yo dewlemend gêno. No rayîr hema zaf newe yo û ma ganî kulturê xo rê, edebîyatê xo rê her çîyê xo rê wayîr vejî.

Na xebata kovare bi keda wendekaranê leteyê kurmançî û zazakî yê Zanîngeha Çewlîgê he'diryena. Çimkî yew şaro ke azê wendekaran zaf bibo. No şar la ra bigêre heta na derzîne her çî de xo aver beno. Ma bawer kenê ke nê nuştayê ma serre ra serre hema zaf vêşî benê. Sazgehanê dewlet de zî eke vernîya ziwanê ma abo, hêdî çikes nêşkeno verîya ziwanê ma bibirno. Kovare edebiyat de tewr cayo muhîm gêna. Eke wendekarê ma, nuşttoxê ma û zanayoxê ma dest û paştî bide yewbin kovara ma ver a ver xişn bena. Ma hêvî kenê, no gird bîyayîşê ma her wext dewam bikero.



Xebata Humerî - Jangarh Singh Shyam

TIRSA ZAROKÎ

Ahmet SUBAŞI

Dayika wî hew diqedand ji ber xirexira wî deyax bide. Bi dengêkî bilind, got:

-Kuro! Tu nesekînî dê Gurê Manco were te.

Peyva Gurê Manco bes bû ji bo ku ziravê wî biqetiya. Berî ku dayika wî lembeyê bigire xwe ji nişka ve avête ser nivînên xwe. Ji tirsê piştê xwe da diwêr û li tarîyê nihêrî. Gelo di nava vê tariyê de

tiştekb hebû yan na? Demekê wiha bêdeng ma, xew hêdî hêdî giraniya xwe da ser çavên wî yên ku ji tirsra gurê manco hê jî vekirî bûn. Hew mabû ku têkeve xewê, dengê ku ji nava reşahiyê hat hindik mabû ziravê wî qetanda. Berê pêşîn got hebe nebe ev deng ji kevana nivînên xwişka min tê. Guh û çavên xwe zîq kirin û li aliyê ku deng jê hatibû, nihêrî. Dixwest bi hêdîka lembeyê vêxe, lê dema ku destê xwe dirêjî quncika lembê bike û Gurê Manco bi deste wî bigire wê çî xweliyê li serê xwe bike? Bi vê tirsê pêçiya xwe dirêjî lembeyê kir ku vêxe.

-Xişxişşşş...

Xwedêyoo... wextî dilê wî ji cih derketa. Lê lembe vexistibû. Ku lembe veketî bûya Gurê Manco nikaribû bihata wî, ew tenê gurê şevê bû yê ku zarokan direvand şikefta xwe.

-Xişxişşşş...

Zarok destên xwe danîn ser çavên xwe û pişta xwe bi diwêr zeliqand. Demekê wiha ma û hêdî hêdî çavên xwe yî ku ji tirsra zoq mabûn ji nava destê xwe derxist. Ev deh deqîqe ku lembe vexistî bû, heke ku hinekî din jî lembe vekirî bihişta, dê bavê wê pê bihisiyana û bihatana. Dû re dê henekên xwe pê bikira û dê qala nezilambûna wî bikira, li gorî bavê wî zilam ji tu tiştî û tu kesî natirsîn. Ji ber vê yekê zarok gelek caran şerm dikir ku tirsra xwe bîne ziman. Lembeyê bi dîlnexwazî be jî girt û serê xwe xist bin lihêfê.

Axx dayê! "Ma qey te qala Gurê Manco nekira nedibû?" got di dilê xwe de. Ew hev nas dikirin lê gava ku gurê manco bihata dê çawa ev yek jê re bigota, dê kengî bibûya sibe.

Peyva Xwedê ji devê wî qut nedibû. Carekê xwişka wî bi awayekî henekî jê re

gotibû dema ku tu bitirsî alîkariyê ji Xwedê bixwaze. Wî jî ev hêvî dikir.

-Xwişkêêê... Xwişkê.

Çend caran bang kir jî xwişka wî ranebû. Dayika wî rast digot. Ku xwişka wî ketibe xew dinya jî xera bibe ew pê nahise.

-Xwişkêêê... Xwişkê.

Dîsa bangî wê kir lê tu bersiv ji wê nesitend. Îja wê çî bikira? Ku biçûya odeya dê û bavê xwe teqez wê Gurê Manco wî di de bigirta. Ji xwe odeya wan jî dûr bû. Dibe ku biçûya cem xwişka xwe û li cem wê raza. Lê dema ku biçûya cem xwişka xwe wê Gurê Manco bi lingê wî bigirta û birevanda? Ev fikr saweke din xiste dilê wî. Xwedêkirî ku mîza min nayê ez ê çawa biçûma tiwaletê, got di dilê xwe de. Hê xwe ji wê sawê rizgar nekiribû dengêkî bilind hate wî. Bi deng re xwe kir wek gulokê.

Pişta xwe hingî ku bi dîwar ve zeliqandibû, pişta wî cemidibû. Bi tirs be jî ew ê biçûya cem xwişka xwe. Demekê guhê xwe da tariyê lê tu deng nedihat bihistin. Nivîna xwişka wî li ber pacê bû, bi gavên mezin ji nav nivînên xwe derket û ber bi xwişka xwe ve baz da.

-Xişxişşşş... xişşşşş...

-Yadê yadê, got bi dengêkî bilind û xwe avête ser lingên xwişka xwe.

-Xwişkêêê xwişkê...

-Çi bû!

-Ez li cem te razê?

-“Baş e, tamam” gote wî û kêleka alî dîwêr jê re vekir.

Zarok bi lezgînî kete kêlaka xwişka xwe, bêhna wî derket. “De bila Gurê Manco were min bibe”, got di dile xwe de. Vê carê xwişka

wî li cem wî bû. Dîsa xew kete çavên wî,
hew çavên xwe girt û raket...

-Xişxişşş...

Ziravê wî ji tirsra re wextî biqetiya.

-Xwişkêêê xwişkê Gurê Manco hat, gote
zarok bi dengekî nizm û tirsonek.

Lê ji xwe xwişka wî dengê xwe
dernexist. Gurê Manco wî li vir jî dîtibû,
ma xelasi ji Gurê Manco tune bû qey?
Zanibû ku xewa xwişka wî giran e, hema
niqurçek dayê.

-Xwişkêê.

-Nebixêrê dîsa çi bû?

-Gurê Manco hatiye min birevîne.

-Ev çend care ez ji te re dibêjim Gurê
Manco tune ye, ev gişt, ji serê dê û bavê
min derdikevin.

-Xişxişşş... xişxişşş...

-Binêre binêre te jî bihîst!

Xwişka wî jî ev deng bihîst, ji bo dilê
birê xwe rihet bibe rabû ser xwe ku here
lembê vêxe. Zarok xwe bi şipşidandî bi
destê xwişka xwe girêda. Xwişka wî lembê
vêxist lê tu tişt li odê nedixuya. Lê ji ber ku
hê jî deng dihat zarok hew mabû rapelike
ser serê xwişka xwe.

Xwişka zarokî destê birayê xwe berda
û ber bi cihê ku deng jê dihat ve çû. Ji ber
ku perperokê di tûrekî ji lek de asê mabû
û deng derxistibû ew deng jî dibû sebaba
têkoşîna rizgariya wî. Xwişka wî perperokê
ji pacê derxist derve û wê gihande azadiya
ku bûbû sedema xerakirina xewa wê û tirsra
birayê wê.

Zarokî xwe avête nav nivînan, dilê wî jê
re digot ku sedema wî dengî ne perperok
be? Guhê xwe dîsa ber bi reşahiyê ve kir,

lê tu deng nedihat. Axirî dengê nehat
hew diwêribû ku tişteki jî bibêje. Lewra
dizanibû ku vê carê wê xwişka wî pê
bixeyide. Çiqas di dilê wî de saw hebû jî
serî xist nava lihêfê û bi hêviya jibîrkirina
Gurê Manco çavên xwe girt.

-Xişxişşş xişşşş.

ŞARÊ MA

Şahap LAÇÎN


Veng û sewtê ma hêdî vînîbîyayîştê
Ziwan û edetê ma vîrîbîyayîştê
Deyîr, kilam û şîir ma nêvacîyayîştê
Şarê ma xo bê şarê ma aya xo bê

Xo rê wayîr vecî xo bêwayîr nêverdo
Şar û xerîb nîno ma rê wayîr' nêkeno
Ziwanê ma binê ziwanan de şarî do
Şarê ma xo bê şarê ma aya xo bê

Şarê ma xo vîrî kerdo hîşar xo nîyo
Şarê ma xoser û lingan de xo ser nîyo
Xo bi xo, xo nêvînenno wayîr' xo nîyo
Şarê ma xo bê şarê ma aya xo bê

Ezîzî va ke, dinya de yew dar' ma çinya
Raşta vato heqeta zî yew dar' ma çinya
Ma qey wina bî sebî, ma nêzana sebena
Şarê ma xo bê şarê ma aya xo bê

Her vaş kokê xo ser beno hêşin û zergûn
La kokê ma nêmando ke vaş bibo zergûn
La ziwanê ma qeyda ma mandî bêziwan
Şarê ma xo bê şarê ma aya xo bê



PORTEQAL

Kerem CAN

Rojekî ez digel kekê xwe li ser traktorê ji çolê dihatin. Rojeka payîzê bû hewa sar û şilî bû, li asîmana 'ewr xuya dikirin. Rojek berê diya min, kekê min û xwişka min, ji bo dadana tenûrê çûbûn darikê pembûyê berhev bikin û em jî ji cihê ku darik berhev kiribûn, dihatin. Dema em bi rê ketin û hatin, di rê de em li rastî gundiyeke xwe hatin, ew gundiye me ku navê wî Îrfan bû ji bajêr dihat, em ji bo wî sekinîn û me ew li traktorê siwar kir û me ber bi gund ve hereket kir. Ez li ser rûniştoka traktorê bûm, kekê min got;

- Cihê xwe bide mamê Îrfan û tu were kêleka min.

Min bi gotina kekê xwe kir, min cihê xwe da mamê Îrfan û ez çûm li kêleka kekê xwe li ser piya sekinim. Di destê mamê Îrfan de poşetekî porteqalan hebû, wî ji poşet porteqalek derxist û da destê min, min rahişt porteqalê, min ji porteqalan gelek hez dikir. Dema ku porteqalê da min, ez gelek kêfxweş bûm. Min bi destekî xwe porteqal girt û bi destê din jî bi hesinê traktorê girt da ku nekevim. Em gihîştin gund. Li gundê me cihê heye ku em ji wir re dibêjin serê

darê. Dareke dirêj di binî de wek em bibêjin diwarek li ser kevira rast kiriye, bankeke ku ciwan û zilamên gundî li wir dicivin, li ser wê darê rûdinên. Dema ku em dihatin gund em ji wir derbas bûn, wê wextê jî gelek zilam li wir rûniştî bûn. Em qederek ji wan derbas bûn, mamê Îrfan ji kekê min re got bisekine ez ê peya bibim. Traktor zû diçû. Kekê min ji nişka ve pê li firênê kir, ez ji cihê xwe wer bûm, çûm ber tekelê pêş, porteqala min jî ji destê min ket. Kekê min nizanibû ku ez ketime. Ez ketibûm nav xetereke mezin, zilamên ku li ser darê rûniştibûn ew hal dîtin, kekê min kir ku traktorê biajo, zilaman bi dengê berz qîr kirin û gotin;

- Raweste, raweste!

Kekê min bi dengê wan bilezûbez û biqewet pê li firênê kir ku hema hinekî din jî biajota wê traktor di ser min re derbas bibûya. Axir ku Xwedê ez xilas kirim û ji mirinê filitim. Kekê min bi min hisiya û ji traktorê peya bû, hat bi telbê min ve ez rakirim, herdû destên xwe da ser milên min ku min bibe malê. Mala me nêzik bû. Bi tevî neh deh gav dûr bû. Li ser milê kekê xwe, ez jixwe çûbûm, ji mirinê filitibûm. Lê ez vî tiştî nedifikirîm ku bi masûmiya zarokatî bi dengeke hêdî û xemgîn min ji kekê xwe re got.

- Keko kanî porteqala min.

Kekê min kelogirî bû û got;

- Porteqala te çû.

Ez ji mirinê filitibûm lê li ber xwe nediketim li ber windabûna porteqala xwe diketim. Dilê min ji bo porteqala min êşiya...

Bigirî zarok

ne xewn e, a ku ji destê te de ketî

ji ber ku porteqal rengê xerîb e.

LI SER DERGÛŞAN ÇEND BAWERÎYÊN BALKÊŞ YÊN FOLKLORÎK

Fatma OKTAY

Folklor bi berfirehî û wergiriya xwe ve hema bêje di hemû beşên jiyana me de bi awayekî xuya dike. Ji jidayîkbûnê heta mirinê, ji erd heta ezman derbarê her tiştî de bawerî û tecrûbeyên hezarsalî yên mirovahiyê hene. Ev bawerî û tecrûbeyên gelêrî wexta ku wekî keresteyên folklorîk bêne nirxandin, mirov dikare pirr tiştan jê derbixe. Jidayîkbûn jî yek ji wan beşê jiyana me ye ku wekî destpêka me ya li darê dinyayê tê hesabandin. Hatina me ya li vê dinyayê helbet tiştêkî zehf muhim e. Ji ber vê yekê ye ku mirovan ji berê de derbarê dergûşan de pirr tişt gotine û tecrûbe kirine. Derbarê van tecrûbe, gotin û baweriyên pelepûç de min ji Sêrtê û Agirî/Qereklîsê çend tiştine balkêş berhev kirin;

- Dema ku Xwedê zarokekî/ê bide malekî û ew zarok jî bi şoravkê\ava şortê tê şuştin, wicûda wî/wê qayîm dibe û zû naşeliqe.

- Xwedê zarokekî/ê bibexşîne; mirov tenî û xwelî li nav hev dixistin û li çavên zarokî/ê didan da ku dema zarok derkeve ber tavê



Xebata Hunerî- Samwais
Dema em hemû zarok bûn

çavên wî\wê zarokê/î neşewite.

- Dema ku Xwedê zarokekî/ê nû bide heke şîrê diya wî\wê tune be şerbetê (ji şekirê çayê û avê çêdibe) li devê wî\wê dikin.

- Dema ku zaroka/ê jinekê çêdibe û di nava çil rojan de zaroka jineke din jî çêbibe, herdû jin bi hev re derzîyekî diguherînin. Welê tê bawerîkirin ku heke derzîyên xwe bi hev re neguherînin û di nava çil rojan de dengê wan jinan here hevûdû zarokên wan zû bi rê ve naçin.

- Dema zarok ji dayik dibe heta du-sê rojan li ser bêjîngê tê razandin û kêr û melkesekê datînin li ber serê zarokî/ê da ku ew zarok netirse.

- Dema ku zarok êvarê derdixine derve zarok bi hîvê dikeve, tînin hinek ar û hinek xwê û xweliya heft heb stûna hillhidin û sê daran davêjine kêranên malê, bi vî awayî tirsra zarokî/ê tê girtinê.

- Divê dengê zarokekî/ê çilidarî neçe mirîşk û elokên qup\kurk. Heke di nava çil rojan de deng here qupan\kurkan çêjikên wan çênabin.

- Dema dergûş zerikî dibin serê wan bi ava ku zêrekî avêtine navê dişon ji bo zerika wan ji wan here.

- Dema zarok zerikî dibin tînin kûlikê (sergo) li ber derî qul dikin û sê caran zarokê tê re derbas dikin ew zaroka pak dibe.

- Dema di gowdê dergûşê de birîn derkeve tînin bi şîr ve serê wê/wî dişon da ku gowdeyê wan rehet bibe.

- Dema ku Xwedê zarokekî/ê dide, ji bo kes çavînî li wî/wê neke moriyên reş û sipî bi tayê ve dikin û bi milê dergûşan ve dikin.

- Dema ku zarok ranezê, bêîştah be û nexweş be tînin zarokê perpû dikin (zarokê datînin erdê sê caran lingê xwe li ser wê/wî re dizivîrin).

- Dema ku çilên zarokan derdikeve, tînin şehê qîçik û çil libên genim an jî ceh têdixine nav ava wê, çilê wê/wê ji ser hilhidin. Dayîka zarokî/ê dibêje ez çilên maran, çilên mişkan, çilên çi qas heywanan li dinyayê de heye ez gişkî ji ser zaroka xwe hildidim.

Elbet li ser vê mijarê tiştên din jî hene lêbelê tiştên ku me bi dest xistine ev in. Ji ber çi li ser zarokan tiştên balkêş derketine holê? Çima tiştên wiha niha tune ne û nayêne hemilandin? Belkî li hinek deran jî tiştên hêja hebin û nemaze li gundan. Çunku her tişt li gorî şert û mercên devera xwe derdikevin holê. Ji bo ew wextên ku ev tişt derketine holê wek niha ne bijîşk hebûne ne jî derman hebûne. Gel jî li gorî xwe tiştên wiha derxistine holê. Ev tişt jî heye heke ne ji bo zarokan bûya li ser vê mijarê belkî ewqas tişt derneketibûya holê. Ji ber ku zarok berdewamiya zûriyetê ne û her wiha jî ji bo malbata xwe bi taybet in. Ya herî baldar jî li ber çavên diya pir biqîmet in. Heke tişteke were serê zarokî/ê, dê xwe li ser wî /wê dikuje. Ji bo zarokekî/ê nû jidayîkbûyî tişteke neyê serê wî/wê çi tişt hatiye bîra gel û çi ji destê wan bê texsîr nekirine û ew tişt kirine. Me li jor jî behs

kir mesela ji bo zarok di xew de netirse wek kêr milkis danîne ber serê wê/wî. Heke şîrê dayîkê tûne be ji bo zarok nemire îcar yek rojî şerbet çêkirine û danê. Dayîk ewqas li ser zarokên xwe disekin jî bo ku tu kes çav li wan nekin moriyên reş û sipî bi tayê ve kirine û xistine destê zarokên xwe. Heke lêkolînek baş were kirin ez bawer dikim ku tiştin din jî wê derkevin holê. Lêbelê yên ku me bidestxistin ev in.

QICKEKA MI

Berfok KENDAL

Qickeka mi
Ti meberm!
Ti helak bermenî
Pukelek veciyeno
Xelanê zerê mi
We şoneno

Helak ti bermenî
Yew laser veciyeno
Yega û baxçeyanê zereyê mi
Talan keno baxçeyanî

Wexta ke ti bermenî
Dinya mi rê beno
Zehr û cehennem
Her çi vêşeno

Helak ti bermenî
Yew qers kuweno zereyê mi
Tîje zî nêşkena mi bikera germin

Tik tena
Wuyayîşê to
Tim bi wuya
Qickeka mi

DI ÇANDA KEVNARE DE STÊRKNASIYA GEL

Ahmet SUBAŞI

Ji serdemên kevnare û vir ve ji zanista ku herî zêde bi pêş ve ketiye astronomî ye ku bi saya meraqa mirovan a di derbarê asimana de derketiye holê. Vê pêşveçûnê, rê li pêşveçûna zanistên wek matematîk, fîzîk, kîmya û hwd. jî vekiriye. Di şaristaniya kevnare de, ji ber ku ronahiyeke baş nehatibû ditin, şev bi hemû hebûna xwe ve jiyana mirovatîyê dorpêç kiribû. Ji xwe mirov bi pîranî dema xwe li derve, li bin asîmanan derbas dikirin loma jî tevgerên hîv, roj, dûvstêrk û bûyerên ku li asîmanan diqewimîn ji bo wan giring bûn. Wan digot qey têkiliya stêrkan û Xwedê bi hev re heye lewma jî asîman bêtir bala wan dikişand.

Îroro em ji yê reweqdar wekî 'stêrk' bi nav dikin û ji yê din re jî em dibêjin 'gerstêrk'. Bi taybetî jî girtina hîv û rojê û tevgerên wan yê ku bi hêsanî dihatine dîtîn, gelek bala wan kişandiye. Cihê stêrkan ji bo ku rêya xwe pê bibînin bi kar anîne. Ji bo plan û xebatên xwe salnameyên ku têkildarî tevgerên hîv û rojê ne, çêkirine. Stêrkên ku nêzî hev xuya dikirin, kirine kom û bi vî awayî jî komstêrk diyar kirine.

Şaristaniyên Ewil

Di şaristaniyên kevnare de Babîliyan bi çandiniyê re mijûl dibûn û bi gelek civakan re jî danûstendin dikirin. Bi vê danûstendinê re, têkiliya çandî jî çêdibû.

Piştî demeke dirêj dîtî ku tevgerên hîv û rojê ne ketober in û li gorî deman diguherin. Wekî din stêrkên nezî hev nav li wan kirin û komstêrkên ewil diyar kirin. Misiriyên jî ji aliyê salnameyê ve xebatên giring kirine. Lewra divêtî bi zanibûna kengî dê ava çemê Nîlê bifûre û li gorî wê jî zeviyên çandiniyê diyar bikin hebû. Ev xebatên wan, zanistên wek mame tematîk û geometriyê bi pêş xistin e.

Têkiliya Kurdan ya bi Astronomiyê re

Kurd ne weke van şaristaniyan bin jî ji hêla astronomiyên ve bi hêsani mirov dikare vê rêçê di jiyana wan de bibîne. Herwiha hîne navê gelek stêrk û gerstêrkan, di nava kurdan de bi awayê xwe yê resen, hene. Asîman gelek bala kurdan kişandiyê û gelek nav li stêrkan kirine.

Hin ji wan stêrkan ev in;

Stêrk an gerstêrkên wek Komika Eshaba, Stêrka Mexrebê, Stêrka 'Eşayê û hwd di nav gel de hene lê mixabin min navên wan î zanistî bi dest nexist û ez mecbûr mam tenê navên wan î kurdî bidim.

Komstêrka Mêzîna Xêr û Guna (Oryon) jî 77 stêrkan pêk tê, bi taybetî sê stêrkên ku di rêzê de ne bûne sedama vî navî. Lewra ev stêrk di awayê mêzîne de ne. Ez wiha difikirim ku lêkolînek li ser etîmolojiya vî navî were kirin dibe ku tenê "Mêzîn" were dîtî. Lewra li hin hereman hîne jî tenê jê re dibêjin "Mêzîn". Heye ku piştî pejirandina ola Îslamê û bandora wê ya mezin ev nav di nava gel de guheribe. Ev yek tiştekî gelek giring nişanî me dide ew jî ev e; kurd piştî pejirandina ola Îslamê xebatên amator bin jî, ji aliyê astronomiyê ve xebitîne û çavdêrî li asîmanan kirine. Ji aliyê din ve wiha tê texmînkirin ku her sê pîramîtên Misiriyên jî li gora wan stêrkan hatine çêkirin.


Kurdî	Îng/Lat/... ¹	Tirkî
Rêya Kayê/Rêya Kadiza	Milk Way	Samanyolu
Mêzêna Xêr û Guna	The Hunter / Oryon	Avcı
Termê Vaja / Termê Merxê	Ursa Major	Büyük Ayı
Leyl û Mecnûn ²	Sirius û Arcturus	Akyıldız û Çoban T.Y'nın Alfa Yıldızı
Komika Sêwiyan	Taurus	Boğa Takımyıldızı
Perwîn ³	The Pleiades	Süreyya
Gerstêrka Karwankuj ⁴	Venus	Venüs

1 - Di vê beşê de min nikaribû hemû zimanan bide, lewre hin stêrk bi navên zimanên cuda ne.

2 - Leyl û Mecnûn li hin hereman wek Mem û Zîn jî tê binavkirin.

3 - Perwîn û Komika Sêwiyan di komika Ga de ne lê ne heman stêrk in. Perwîn stêrkek tenê ye.

4 - Stêrka Karwankuj, Gelawêj û Stêrka Sibê heman gerstêrk in. Tenê di nav gelde bi navên cuda tên zanîn. Herwiha ev gerstêrk, weke stêrkan di nav kurdan de belav bûne.



Gerstêrkên di Pergala Roja Me de

ya Yekitiya Navneteweyî ya Stêrnasiyê (YNS), gerstêrk ew cîsmên asîmanî ne ku li dora rojê li gora rêhegekê digerin. Dîsa li gorî pênaseya YNSyê di pergala roja me de, heşt gerstêrk hene. Ji van gerstêrkan hinek ji wan bi navê xwe yî resen di nav gelê kurd de têne nasîn.

Mîtoloji

Weke ku tê zanîn gelen berê di jiyana xwe de bi heweskarî be jî bi stêrnasî û esmangerî yê re mijûl

Yewnaniyan ji Rêya Kadiza re digotin Rêya Şîr, Tirk jî dibêjin Samanyolu gelo Tirkan ev peyv ji ku derê aniye? Bi rastî jî

Kurdî	Tirkî
Tîr	Merkür
Gelawêj	Venüs
Erd/Cîhan	Dünya
Behram	Mars
Bercîs	Jüpiter
Keywan	Satürn
Uranûs	Uranüs
Neptûn	Neptün

ev tiştêk gelekî meraqa meriv dikişîne. Dibe ku ew ev peyv ji kurdan girtibin. Lewra kurd jî bo sedema vî navî çîrokekê jî dibêjin. Ev jî vê ihtîmalê bi hêz dike.

Navê stêrk û gerstêrkên ku min di tabloyê de dane navên resen in û gel bi xwe van navan

afirandine û hîne jî navê wan di nava gel de hene. Ji wan stêrkan, her çarên dawiyê min navên wan î zanistê nedît, loma jî min li hemberî wan pirsnişan danî.

bûne. Nav li stêrkan kirine û li gorî baweriya xwe awayê komstêrkan şirove kirine û şibandine gelek tiştan. Bi taybetî jî di dîroka misrî, yewnani, babîliyan û hwd. de mîtoloji cihekî gelek giring digirt. Di nav kurdan de jî mîtoloji û baweriyên pûç hebûn û hê jî hene.

Mînak;

Kurd navê Mêzîna Xêr û Guna (Oryon) li wan her sê stêrkan kirine. Li gorî baweriya wan ev stêrk roja qiyametê dê dakevin bajarê Şamê û li wir xêr û gunehê mirovan biwezînin û bi vî awayî hesabê mirovan ê bê dîtin.

Leyl û Mecnûn (Sirius û Arcturus), ev her du stêrk li asîmên cîsmên herî geş in. Leyl stêrkeke spî ye, Mecnûn jî sor e. Li gorî baweriyên di nav kurdan de salê du caran ev stêrk tên cem hev û li hev dikevin, kî ku vê bûyerê bibine, ew çî bixwaze dê Xwedê qebûl bike.

Hûn nebêjin qey ev bawerî ji ber xwe ve derketiye holê, dema ku meriv lêkolînekê li ser tevgerên cîsmên asîmanî dike meriv dibîne ku di hin deman de stêrk dikevin ber hev. Ev jî bi sedemên vê baweriyê re li hev tê.

Dema ku dinya di rêgeha xwe de dizivire di dîrokekê de ev her du stêrk dikevîne heman texmê (*Mixabin ez nizanim ev bûyer kengî diqewime, lewma jî min dîrokek neda.*). Kurd jî vê bûyerê wek hevdiîtina van stêrkan dîtine. Ev bawerîya pûç dibe ku ji ber hez kirina ji Leyl û Mecnûn ku wek Mem û Zîn jî têne binavkirin, derketibe holê. Ez wiha texmîn dikim ku ev bawerî ji dewrên qedîm tê.

Termê Vaja (Ursa Major), ev kom stêrk ji heft stêrkan pêk tê. Kurd vê komê heşt stêrkî dihesibînin. Sedema navê Termê Vaja, ji çar stêrkên ku li binyê stêrkên din wek çardarekê rawestiyaye, tê. Çar stêrkên xeynî çardarê, bi navê dê, jin, xwesû û stêrkeke biçûk (zarok) jî li ber jinê rawestiya ye, şibandine term. Ji ber vê stêrka biçûk, kurd, vê komstêrkê heşt stêrkî hesibandine. Termê wateya ajaleke mirî û Merx jî tê wateya yabanî ardiç. Her wiha bi raya min li vaja tê wateya vajî, eks, berevajî.

Di gelek şaristaniyan de hin tişt nîşana xerabûna dinyayê bûn. Li gorî kurdan jî dema ku Termê Vaja û Komika Sêwiyan bigihêjin hev ê dinya xera bibe. Lewra Komika Sêwiyan serê Termê Vaja jê kiriye û hînê jî ev serî di nav Komika Sêwiyan de ye. Termê Vaja jî dixwaze heyfa xwe hilde û serê xwe bistîne. Bi rastî jî dema ku mirov li Komika Sêwiyan dinêre stêrkeke geş di nav komê de balê dikişîne.

Kurd hînê jî dema ku dê herine çilo li Komika Sêwiyan dinêrin. Lewra Komika Sêwiyan serê sibê geştir derdikeve.

Li hin heremên Kurdistanê şemitîna dûvstêrkê wek cî guherandina şêxa tê şirovekirin.

Mirov dikarê di warê astrolojiya ku li hin herêman, gelê kurd pê diemilînin de gelek agahiyan bibîne lêbelê tu lêkolînen akademîk li ser van mijaran nehatine kirin, ev jî hin dijawariyan derdixe pêşiya mirov. Lewma jî mirov nikare têkiliya stêrkên di nav gel de û stêrkên ku di zanistê de hatine binavkirin bi awayekî dirist binirxînin.

HEVPEYVÎNEK BI HASAN ÇİFTÇİ RE

Zübeyir DURMAZ

■ *Gelo hûn dikarin bi kurtasî qala xwe û jiyana xwe bikin?*

Belê, ez di sala 1962an de li gundê Baxçecixa (Bahçecik) Depê ya Elezîzê hatime dinê. Min xwendina xwe ya seretayî û navîn li gundê xwe temam kir.

Piştî vê perwerdehiyê min li Elezîzê dest bi lîseya îmam xetîbê kir û min ew li wir xelas kir. Dû re min di medreseyê de perwerdehî dît. Di sala 1986an de min li Zanîngeha Atatürkê dest bi beşa Ziman û Edebîyata Farişî kir û min bi serkeftî beşa xwe kuta kir. Ez di sala 1987an de di heman beşê de bûm asîstan û min di heman beşê de di sala 1992an de lîsansa bilind, di sala 1994an de jî doktora xwe, temam kir. Min di sala 2000an de ûnwana doçentiyê û di sala 2006an de jî ûnwana profesortiyê wergirt.

Ez di navbera salên 2011 û 2014an de li zanîngeha Mûşê xebitîm. Di nîsana 2014an de bi qadroya xwe derbasî Zanîngeha Çewlîgê bûm. Aniha jî li Zanîngeha Çewlîgê wezîfeya serokatiya beşa ziman û edebiyata rojhilatê dikim.

■ *Te hem perwerdehiya medresê hem jî ya nûjen dîtiye. Gelo perwerdehiya medreseyê tesîreke çawa li kurdî û pêşketina kurdî kiriye?*


Di medreseyan de mele û feqî bi kurmançî ders didan û ders digirtin. Hem bi kurmançî û hem jî bi zazakî dinivîsandin. Ev jî bo zimanê kurmançî û zazakî tişteki gelek giring bû. Armanca çûyîna min ya medreseyê ew bû ku ez bibim mele. Weke ku hûn dîzanin gelê kurd dîndar e. Yanî jî

dînê xwe zehf hez dikin û dixwazin li gorî baweriya xwe jiyana xwe bidomînin. Îcar dixwazin zarokên wan jî dîndar bin.

Medrese ji aliyê dîn û kurdan ve tiştêkî pir muhim û rind e. Lê bi min medrese têra perwerdehiya vê dewrê nake. Gava meriv li ser vê rewşê bifikire di her tiştî de meşweret/şêwr, fikir û pisporî lazim e. Divê gelek pispor bên cem hev û perwerdehiyeke layiqî sedsala 21ê damezrînin. Gava ku ev perwerdehî bi destê kesan were avakirin tiştêkî cûda ye lê ku bi destê dewletê ava bibe tiştêkî cûdatir e. Lewra dema ku perwerdehî bi destê kesan ve were avakirin kêmasiyên mezin derdikevin holê. Di medreseyên kurdan de jî ev pirsgirêk hebûn.

Medrese ji bo kurdan û ji bo zimanê

wan xwedî giringiyeke jiyana ye. Çima medrese xwedî roleke wiha ye? Lewra di salên 1920-1930an de zimanê kurdî hatibû qedexekirin. Dema ku kurdî di dibistanan de û di çapemeniyê de qedexe bû, tenê li medreseyên heremên Kurdistanê bi fedakariyeke mezin perwerdehiya xwe bi kurdî didomandin. Gelek însan di vê rêyê de îşkence dîtin û hatin cezakirin. Gelek însan di girtîgehan de hatin kuştin. Li vê derê ne mimkine/pêkane ku ez navê wan bidim, lêbelê di hemû lêkolînan de ev encam derketiye, em vê dizanin. Her çî qas dijwarî û qedexekirin hebe jî feqê û meleyên kurd di medreseyan de perwerdehiya xwe bi kurdî didomandin. Dema ku min li Amedê di medreseyê de perwerdehî didît, Barzanî jî ji aliyê Irak, Sûriye û Îranê di bin zextê de





bû. Wê demê mamosteyê min di her dersê/waneyê de digot “gelo çi hate serê Barzanî”. Tabî di wê demê de TV tune bû, tenê radyo hebû lê ew jî li medreseyan tune bû. Mamoste ev bûyer ji xwe re kiribû xem.

Dema ku min li medreseyê ders didît hemû ders bi kurdî bûn û me bi kurdî dinivîsand û xeber dida. Bi ser de jî helbest û qesîdeyên Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî û hwd. hebûn û me ew dinivîsand. Wê demê li Amedê kevneşopiyê wîha hebû, qesîdeyên li medreseyan hemû bi kurmancî bûn û hinek hevalan ew qesîde gelek xweşik dixwendin û me jî kasetên wan distendin. Piştî wê ji ber ku hatin qedexekirin me ew îmha kirin. Lêbelê ew qesîde di çarçoveya kurdî û kurdiya nivîskî de, ji bo pêşeroja kurdî gelek girîng bûn. Li medreseyan fikir û ramanên nijatperest nîn bûn. Dema ku min li Amedê, Êlihê û li Mûşê dixwend perwerdehî dîsa bi kurdî bû.

Min demekê li Elezîzê jî xwend, li wir perwerdehî bi gelemperî bi zazakî bû. Lê weke ku min pêşî jî da nîşan perwerdehiya ku li medreseyan tê dayîn ne ehîl e. Li pêşiya

wan hinek pirtûk hene û ew wan pirtûkan li gora rêzê dixwînin, fikra wan î ku jiyane ava bikin û bi awayekî nû perwerdehiyê bidin nîne. Ev jî kêmasiyê mezin derdixe holê ji aliye medreseyan ve, nemaze jî ji bo vê dewrê. Bêguman meriv li nivîskar û helbestvanên xwe yî klasîk binêre hemûyan jî perwerdehiya medreseyê dîtiye. Mînak Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî dîv re gelek melayên xurt li Amedê, Batman û Mûşê hebûn. Cegerxwîn bi xwe jî li medreseyan perwerdehî dîtiye. Û hûn bawer bikin ku li medreseyan ji helbestên erebî pirtir ê kurdî hebûn. Min jî berî anîha bi 35 salan helbestên kurdî dinivîsand, lê hînga me alfabeya erebî bi kar dianî. Wê dewrê gelek qesîde dihatin xwendin. Dema ku xwendekar diçûne malê hingî ku malbatên wan ji qesîdeyan hez dikirin ji zarokên xwe dixwestin ku van qesîdeyan bixwînin. Vê yekê jî ziman di nava civakê de zindî dihişt.

■ *Meraqa we ya li ser kurdî kengî û çawa dest pê kir?*

Dema ku min li medreseyê dixwend jixwe perwerdehiya xwe me bi zimanê kurdî

didît. Lê wê çaxê zimanê kurdî qedexê bû, gava ku min li Zanîngeha Atatürkê beşa farîsî dixwend, li wê derê li ser zimanê kurdî gotarên ilmî pir bûn. Li ser Mem û Zîn a Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran û hwd. Ji bo ku rojekê li ser van gotaran bixebitim min tev berhev dikirin. Bi rastî jî ez bibêjim pêwendiya min bi zimanê kurdî re pir nîn bû, lê xebera min jê hebû. Gava ku min doktoraya xwe dikir ji bo min gelek agahî lazim bûn. Li ser vê sedemê meraqa min a li ser ziman û edebiyata kurdî dest pê kir.

■ *Têkiliyeke çawa di navbera kurmancî-farîsî û zazakî de heye. Hûn dikarin weke pisporekî rave bikin?*

Em, yanî kesên ku bi ziman û edebiyatê re têkildar in, dizanin ku zimanên dinyayê dabeşî beşan dibin. Yek ji van beşan jî malbata zimanê Hînt-Ewropî ye. Malbata zimanê Hînt-Ewropî di nav zimanên cihanê de malbata herî mezin e. Dema em dibêjin Hînt-Ewropî gelek ecêbî jî derdikevin holê. Ji ber ku welatên ji hev pir cûda û dûr hene. Lê lêkolîn û xebatên ku li ser ziman di warê arkeolojî û etimolojiyê de hatine kirin nîşan didin ku zimanê Hînt-Ewropî, zimanên hevrehê in. Ji ber vê yekê em ji wan re dibêjin malbata Hînt-Ewropî. Weke ku di zimanên Ewropî de gelek ziman hene, zimanên Îranî jî di nav xwe de dibe du beş. Di zimanên Hindî de ji sedî zêdetir ziman hene û di zimanên Îranî de jî ji pêncîyî zêdetir ziman hene. Wekî din em zimanên Îranî bi navê; Rojhilatê Başûr, Rojhilatê Bakur, Rojavayê Başûr û Rojavayê Bakur, dabeşî çar beşan dikin. Li vê derê qesta min ne Îrana îro ye, qesta min Îrana kevn e. Dema ku em li Îrana kevn dinerin wê jî Asyaya navîn heta berava Misrê ji wir jî heta Balkanan desthilatdarî kirine. Divê em Îraniyan wek Med, Pers, Part, Selekos û Sasaniyan bihesibînin. Gava ku em wan a

bifikirin, nemaze cihê ku îro kurd lê dijîn, Kurdistana Îranê, Iraqê, Sûriyeyê, Tirkiyeyê û jê pê ve kurdên ku li Qafkasyayê dijîn her dem li van herêman jiyane. Dema ku em li Îrana kevn dinêrin di nav zimanên farîsî û kurdî de têkiliyeke xurt heye. Hem ji aliye rêziman ve hem ji aliye etimolojiyê/peyvnasîyê ve hevpariyek heye. Li gorî lêkolînên ku zimannasan kirine derdikeve holê ku kurmancî, zazakî, soranî û gelek zaravayên îranî ji heman rehê tîn û wekî din ev ziman berdehamiya zimanên Îranê yên kevn in.

Madem ku malbata zimanên Hînt-Ewropî ji rehekê ye, wê gavê divê ji heman derê belav bûbin. Li ser vê îdiayê du teori hene: yek ji wan teoriyan dibêjê ku ev qewm ji Başûrê Rûsyaya îro yanî ji Qafkasyayê, ji dorhêla gola Ūralê belav bûne. Ya din jî, gava ku ev qewm belav bûne hinek ji wan koç Anatolyayê, Hîndîstan, Îran û hinek jî koç Ewropayê kirine lê dîroka wan koçan teqez nîne. Li gorî nêrînan ev bûyer di navbera salên B.Z 3000-6000an de pêk hatiye. Lêbelê ev koç ne di carekê de di demeke dîdirêj de çêbûye.

Her çiqas ku ev qewm belav bûbin jî dema ku em li zimanên wan dinêrin gelek peyvên hevpar hene. Mînak dema ku em li Hîtîtan dinêrin di navbera hîtîti; kurmancî û zazakî de gelek hevparî hene. Em dizanin ku Hîtîtan di navbera salên 1300-1400an de B.Z ê desthilatdariya xwe domandine. Ev jî vê nîşanî me dike ku dîroka hatina kurdan û qewmên ku bi kurdan re eqreba ne ya Anatolyayê heyamên gellek kevn de pêkhatiye. Ji wan qewmên Îranî ku hatine Anatolyayê, dewleta yekem qewmê Medan ava kirine. Dewleta Medan B.Z di sedsala 7an de ava bûye û 150 salê jî desthilatdarî kiriye. Herodot li ser vê mijarê dibêje; ji qewmên Îraniyan yên ku herî pêşî xwe ji

bindestiyê derxistine û dewlet ava kirine Med in. Di wê heyamê de Asûrî jî hebûn û her der talan dikirin û dişewitandin bi taybetî jî heremên kurdan.

Li gorî gelek lêkolînên ku lêkolîneran kirine Med bavûkalên kurdan yên resen in. Ev îdia ji sedî sed nehatiye îspat kirin. Lewra ji Medan pir kêmtir gihaştine destê me. Ev jî di derbarê Medan de ji bo hukma teqez astengê derdixê hemberî me. Her çiqas lêkolîner di nav duduliyên/teredûtan de bin jî ji hêla erdnîgariyê/cografîyayê û cil û bergan ve hevpariyên giring hene. Piştî xerabûna dewleta Medan dewleta Persa ava dibe û Pers jî gelek aliya ve teqlîdên Medan bûn. Hem jî aliya cil û bergan ve hem jî aliya komele ve dewleta Medan teqlîd kirine. Herwiha jî wan gelek peyv jî stendine. Piştî xerabûna dewleta Medan gelek dewlet li herema Kurdistanê ava bûne, lêbelê ev hemû dewlet jî aliya çandê ve wek hev bûn. Ev jî nîşanê me dide ku ev hemû qewm jî kalîkê hevpar in.

Di navbera milletên Kurd û Îranê de têkiliyeke xurt heye. Zimanên Îranî jî dabeşî çar heyama dibin, ji van zimanan zimanê medî zimanê herî kevn e. Yê didoya farisiya kevn, yê sê ya jî zimanê saka û yê dawî jî zimanê awestayê ye. Zimanê pirtûka Avestayê gelek dişibe zimanê kurmançî û zazakî. Di encamê de em dikarin tiştê wîha bêjin ku kurmançî, zazakî û zimanê îranî, rehê heman darê ne.

■ *Di nav zimanê cîhanê de zimanê kurdî li cîhekî çawa de ye?*

Hemd jî Xwedayê dilovan ku îro em di vê rewşê de ne. Deh sal berê li zanîngehan li ser kurmançiyê miqayesekirin û nîqaşkirin tiştê wîsa bû ku pir wêrekî dixwest. Lê îro em dikarin li ser kurmançiyê miqayese û nîqaşan bi rehetî bikin. Li zanîngehan

beşên zimanê kurdî vebûn. Ev, ji bo Komara Tirkîyeyê gaveke mezin e. Belkî ji bo ku ev beş bi destê dewletê hatiye vekirin hinek kurdên me bi vekirina van beşan aciz bûbin lê li gorî min ev ne tiştê baş bû. Di pêşerojê de jî ev beş wê li gelek zanîngeha bê vekirin. Îro li başûrê Kurdistanê bi kurmançî zanîngeh, fakûlte û dibistan hene, ev jî ji bo zimanê kurdî tiştê gelek giring e. Hêviya me ew e ku azadiya ziman û edebiyataya kurdî û çanda kurdî di pêşerojê de, dê pir baş bibe. Di cîhanê de nêzikî 50 milyon kurd hene. Li Tirkîyeyê, Îranê, Suriyeyê, Qazakîstanê, Ermenîstanê û li gelek welatên Ewropayê kurd dijîn.

Kurd îro bi zimanê xwe bi hêsaniyê dikarin binivîsin, bixwînin û bipeyivin. Wek radyo, televizyon û hwd. bi zimanê xwe pêşkêş bikin. Yanî ev pêşveçûna zimanê kurdî di bin destê xwendekarên zimanê kurdî de ye. Divê li ser ziman pir bixebitin û zimanê xwe bi pêş ve bibin.

Berê radyoya Êrîwanê hebû, ma çiqas xweş bû. Hêviya min ew e ku ev xwendekarên zimanê kurdî dê zimanê kurdî bipêşxin û bibin asteke pir bilind.

■ *Ji bo xwendekarên ziman û edebiyata kurdî çi şîret û pêşniyaziya we hene?*

Yekemîn divê xwe nexapînin, divê zanibin ê çi bikin û armanca wan çibe divê ji bo wê bixebitin. Divê xebata wan ne ji bo notan bin. Mînak jî bo dersa gramerê tenê ne ji bo derbasbûnê bixebitin divê ji bo ku gramerê jî serî heta binî baş hîn bibin bixebitin. Ji bo dersa klasîk jî divê xwendekarekî beşa zimanê kurdî nebêje ez Ehmedê Xanî naxwînim, divê bixwaze hem Ehmedê Xanî hem Cegerxwîn hem Mehmet Uzun û hwd bixwîne û hîn bibe.

Divê bêje ku ez ê kurdiyeke wiha hîn

bibim ku hem edebiyata klasîk û hem jî ya nûjen pê hîn bibim. Kengî ku xwendekarên beşa zimanê kurdî bixwazin edebiyata klasîk û ya nûjen bixwînin û şîrove bikin hînga dê bigihêjin asta zanîneke mezin. Lê mixabin li Tirkîye yê çanda belengaziyê heye, em pir kêmtîştan dizanin lê ji me tê ku em gelek tiştan dizanin. Helbûkî em bi tu tiştî nizanin. Divê haya me jê hebe ku em bi tu tiştî nizanin ji bo ku em bikaribin tiştêkî hîn bibin. Bi misogerî em hem metnên kevn û yê nû bixwînin, şîrove bikin û divê em rêzimanê jî baş bizanibin. Helbestên nûjen, pexşan û nivîskarên nûjen divê meriv baş bizanibe.

Divê em ji zimanekî ku dawiyê hatiye afirandin birevin, zimanê derewîn nabe. Di zimanekî de tu dikarî peyvên biafirinê lêbelê her ziman xwedî rê û rêbazekê ye, ji aliyê rêziman ve ji aliyê peyvsaziyê qeydên diyar hene. Ziman tiştêkî balkêş e, wek organîzmayeke ku dijî wek însanekî ye, tiştê ku jê re lazim in distîne lê yê ku jê re ne lazim in jî ji ber xwe ve diavêje. Lê belê kîjana dê bistîne? Lazim e ên ku li gorî qeyd û bendên ziman in avahiya zimanê bistînin.

Ku hûn bixwazin, rehên zimanê kurdî û zazakî û tîkiliya wan î ku bi farisî re, hîn bibin divê teqez hûn farisî hîn bibin. Ku hûn vê yekê nexwazin jî hûn mecbur in farisî hîn bibin. Lewra farisî li gorî zazakî û kurmancî gelekî bipêş ketiye. Divê ji bo kurmancî û zazakî di pêvajoya pêşketina xwe yê sirûştî de farisî wek mînakekê bistînin. Yekî ku bixwaze li ser kurdî bibe lêkolîner divê teqez zimanekî biyanî û farisî û kurdiya klasîk û ya nûjen baş bizanibe.

Xwendekarên ku vê beşê dixwînin divê ji aniha de pirtûkan berhev bikin û pirtûkxaneyekê ji xwe re ava bikin.

ŞÎNENÎGARÎ

Mem ARTEMÊT

Hêç bûne
Qet nasekinin
Xwe ranagirin
Heheyyy gidî
Daybelqiran û Hedwanên min
Qorix kirine
Hemû parzemînen dinyayê
Bi simên çargavî
Bi hêrsa bayê kurmancî
Û pişt kirine
hemû şînen dayikên Kardoxîstanê
"Wî de agir bikev mala van romîyan
bejna Mihemmedê min nişana serê çîyan"
Li du 'egîdan
Tasek ava şor
Deste kinc
Kulme xwelî
Şînen çavsor
Û girtîgehek...
Dayik
Dibin girtîgeh di welatê min de
Dayik
Dibin komek hestiyên gavavêj li dû 'egîdan
Û Dayik li welatê min...

KELEPORA TARIYÊ

EJDER ÊLIH


Em li dibistanê hînbûne ku heta 15 îlona 1902yan jî elektrîk/ceyran hê li Tirkîyeyê tune bûye. Gava ku elektrîk anîn jî ceribandina yekem wekî ku hûn difikirin ne li Stenbolê pêk hatiye. Her çî qas ecêb be jî ceribandina yekem li Mersînê bûye. Di wê demê de karkerê şaredariya Tarsusê (navçeya Mersînê) û welatîyê Awistiryayê Döfler, di çemê Berdanê de santrala hîdroeltrîkêkî saz dîke û belavkirina elektrîka Tirkîyeyê ya yekem li wir tê hilberandin.

Lê mixabin piştî demeke zêde li ser hatina ceyranê re derbas bû, elektrîk gihîştê li ber destê gundiyan. Piştî 80 û 90 salan malên gundiyan ronî bûn. Jixwe qet ne pêwîst e ku ez bibêjim hatina elektrîkê, herî dereng gihîştîye Bakurê Kurdistanê. Teqez hûn jî dizanin ku ev rewş wihareng e. Anha jî em nikarin bibêjin sedî sed elektrîk li hemû gundan heye.

Behseke wiha kurt ji bo dîroka elektrîkê bes e. Ka em werin ser mijara xwe; Gelo gava ku elektrîk hê li gunda tune bû, wan

gundiyan çî dikirin û bi çî egle dibûn? Di dinyayê de ewqas çîrok, çîrcîrok, mamik, pêkenok, meselok hwd.. çawa avabûn? Dema ku çîrok û cûreyên wê hatin avakirin, di gundan de elektrîk hebû? Na! Ez bibêjim: Ev hemû, kelepora tariya şevan e. Ji bo ku dê û bav, zarokên xwe di tariyê de têxine xewê, ev çîrok û meselokên cûr bi cûr vedigotin. Ev jî bi serê xwe bû çandek dewlemend û berdewam. Lê belê ev kelepore, ne tenê di Kurdistanê de, li her derê dinyayê bi vî awayî bû çandek û belav bibû. Lê ez ê werim ser egleyên kurdan. Kurd berî ku ceyran bête Kurdistanê şevê xwe bi çî rengî diborandin, bi çî re mijûl dibûn?

Mirovan bi roj karê xwe dikirin û bi şev jî berî xewê ji ber ku demên wan hebûn û ya herî giring jî elektrîk tune bû şeva xwe



Xebata Hunerî -Sergio Silva

bi şevbihêrkan ve derbas dikirin. Wan di tariyê de sebra xwe bi gotinan carinan jî bi listîkan dianîn. Di tariyê de heta ku tiştêkî giring çenebûya, hundirê odeyên xwe ronî nedikirin. Ger ronî bikirana jî ev amûr bi kar dianîn: find, lokiz, çira, lambe, fanûs hwd. Di nava kurdan de amûrên ji bo ronî kirinê piranî lambe û fanûs bûn. Çendî ku mirov êvaran di tariyê de diman, garan û pezên wan jî ji xeynî karê axûrê herdem di tariyê de diman.

Ka kî dikare bêje temaşekirina televîzyon û guhdariya radyoyê jî gotinên şevbihêrkan xwestir e? Bi kurtasî mirov li rasteqîniya vê pirsê bigere û bêalî bifikire, encameke balkêş dertê bo kurdan û qedera zimanê wan. Em dizanin ku hatina elektrîkê bi xwe re alavên ku bi elektrîkê ve dişûxulin (tv, radyo, kompîter û alavên ragihandinê û hwd.) jî anîn û ev bi temamî jî ne bi zimanê kurdî, lêbelê bi zimanê tirkî bûn. Ev yek jî bû pirsgirêkeke sereke ji bo gundiyên kurdan. Kurdên li gundên çiyê yên ku emrê xwe de tenê çend çaran rastî zimanê tirkî dibûn, êdî bi radyo û televîzyonan ve her roj bin tesîra zimanê tirkî de diman. Bi vî awayî zimanê wan yê li malê bere bere diguherî û cihê xwe jî zimanê tirkî re hişt. Zimanê tirkî bi rêya televîzyonê li ber çavên herkesî prestîjek bi dest xist û wekî zimanê kesên modern û

zana hate hesibandin. Êdî bi demê re be jî ji televîzyonê fikir, raman, çand, kevneşopên tirkan hildan û xwe şibandin kesên modern ên di televîzyonê de. Piştî demekî xebardana nava malê bû tirkî, nifşên nû jî bi vê bandorê bûn tirkîaxêv. Hinekî wan zêdetir pê de çûn û xwe wekî tirk hesibandin.

Ji hêleke din jî hin pirsgirekên din derketine holê. Wek mînak, îro bi hatina amûrên bi elektrîkê tên şixulandin, mirov ketine jiyaneke monoton. Li gorî têgihîştina gelemperî, jiyana bi elektrîkê ve girêdayî ye. Gelo nifşên ku berî me jiyane tiştêkî wisa bihîstibûna, wan dê çi bigota? Ev bersiv bi serê xwe mijarek e. Li gorî we jî jiyana bi elektrîkê ve girêdayî ye? Li gorî min, di hin mijaran de jiyana rasterast bi elektrîk û amûrên wê ve girêdayî ye. Lê divê elektrîk di jiyana rojane de wek tiştêkî jêneger neyê dîtin.

Lêbelê bi hatina elektrîkê re jî elektrîk wek amûrek pêşketina çandê hatiye dîtin û nebûna wê jî sedema paşmayînê. Îro televîzyon û radyo ketine dewsa çîrok û dengbêjan. Piraniya weşanên televîzyon û radyoyê bûye sedema windabûna çanda devkî. Jixwe tê zanin ku aniha televîzyon di nava piraniya malên welatîyên Tirkiyeyê de heye. Ev amûr êdî di malan de bûye şertek û tunebûna wê jî kêmasiyeke pir mezin tê hesibandin.

Gelo çîrok û dengbêjî xweşik û çêtir bû bo me an televîzyon û radyo? Rast e ku wekî nostaljî em ê her gav bîra çîrokbêj û dengbêjên xwe bikin. Lêbelê di vê serdemê de divê mirov çanda xwe ya devkî –çi çîrok, çi jî dengbêjî- li ser televîzyon û radyonan bide temsîlkirin. Divê em xwe bi amûrên teknolojiyê ve nekin wekî robotan. Ji bo dembihurandinê çanda me têra xwe dewlemend e.

EY DÎLBER


Mazlum ŞEMZİNİ

Di tîrmeha havînê de
Qerisî merema dilê min
Û şevên zilmatî de
Tu nebûy çirayê hêviyên min
Di nav xeyalên bihuştî de
Qêrinek...
Qêrinek dojehî
Kevokên dilê min ketin kemîna te
Kemînek sermestî de
Ey dîlber!
Ka bêje
Tu çima bûyî dîlber
Ma tu têr nabî
hêsirên çavên min?
Di her hesirê de
Şîn digirin deşt û zozan
Û xemgîn dibin 'erd û asîman
Bî dengêkî şevat û jandar
Bang dîkin
Wa hevalo!
Wa birako!
Ka bêje
Mirî çima dijîn



SEMSÛR

Kübra Öztürkeri



Semsûr bajarekî Bakurê Kurdistanê ye. Sînorên bajêr li bakur Meletî, li rojavayê Meraşê, li başûr bi Rihayê, li rojhilatê jî bi Amedê re heye. Wekî beşe dûrketî ya Bakurê Kurdistanê Semsûr xwediyê ferheng û devokeke cihê ye. Pirraniya niştecihên wê ji kurdan pêk tên. Navên navçeyên Semsûrê bi kurdî wiha ne; Bêsnî, Çêlikan, Sergol, Semîsad, Sinciq, Tût, Aldûş, Kolik.

Wekî din çend navên vê bajarê şîrîn yên ku zêde nayên zanîn jî hene; Kor Semsûr, Wadî Leman, Yedîyeman. Ji gor hinek gotinan ji di wateya welatê dayikê de tê gotin ku 'Ya-dê-ya-min'.

Devoka Semsûrê ji devokên din dûr ketiye. Ne tenê ji aliyê peyv û fonetîkê ve lêbelê jî aliyê rêzimanê ve jî ev devoka guheriye. Her wiha, şayanê gotinê ye ku em bibêjin di navbera devoka semsûrê û zazakî de têkiliyeke fonetîk ya guherîna dangan jî heye. Bi tabloya li jêr ve me xwest ku em çend peyvên kurmanciya standart û yên devoka semsûrê bidin ba hev da ku ferqa di navbera wan de baştir bê fehmkirin.

Kurmancî	Devoka Semsûrê
Xwe	Gendi
Hînge	Hîngo
Dîsa	Dîso
Dar	Dor
Herdu	Hurdî
Lê dinêre	Mes dike
Meriv / mirov	Mari
Çawa	(Çing (çito
Xerîb	Xerîv
Baş	Rind
Xwişk	Xwang
Qelem	Qalam
Nivîn	Cîhî
Sendelî	Sandala
Derî	Qopî
Razandin / rake-tin	Rakatin
Neçe	Mere
Xeberdan	Şor kirin
Qet	Ter
Ling	Nig
Dît	Dî
Axaftin	Dengkirin
Şemî	Paşînê
Dayîk	Dok
Kengî	Kîngo

EVÎNA
QIJIKA BELEK
Û
KEWA GOZEL

Haşem TÎLKÎ

Rojekê, bêhna Qijika Belek teng bibû û ji xwe re di nav daristanê de wek serxweşan digeriya. Di nav daristanê de kî bidîta bela xwe tê dida û hemû niştecihên daristanê aciz dikir lê dîsa jî Qijika Belek rehet nedibû û bêhna wî dernediket.

Qijika Belek hat li ber siya darekê ket nava xewn û xeyalan. Di hişê wî de gelek tişt derbas dibûn û didît ku sînoren di nav civatê de hebûn, rabûne, hemû kes azad dijiyan û tu kesekî/ê ji kesên din zêdetir an kêmtir nîn bû.

Di nav van xeyalan de Qijika Belek di bin siya darê de di xew re çû. Qijika Belek di bin siya darê de kete xewê û xewnên qerebalix didît. Êdî êvara dereng bû û Qijika Belek dengê wê wek dengê Evdalê Zeynikê xweş bihîst û ji xewa xwe ya şîrîn rabû û li derdora xwe nihêrî û di carekî de rabû ser xwe. Dît ku Kewa Gozel li ser darê wek hîva çardeşevî dibiriqe.

Gava ku wî Kewa Gozel dît, di carekî de bû evîndarê wê û êdî Qijika Belek ketibû xeyala Kewa Gozel û evîndariya xwe. Qijika Belek bi ser xwe ve hat û bang kir:

- Bedewa cihanê tu çawa yî?
Roniya rojê, hela were jêrê ez te bibînim.



Piştî van methiyeyên ku Qijika Belek ji Kewa Gozel re kir, pişika Kewa Gozel werimî û te digot qey ew tenê ne çûkeke Xwedê ye, ew şahê gerdûnê ye. Kewa Gozel qet poz bi Qijika Belek nekir û Qijika Belek her ku methiyeyên xweş digotin, Kewa Gozel jî ewqas pozbilind dibû.

Lê evîna Qijika Belek wek evîna Mem û Zînê, wek evîna Siyabend û Xecê bêhed û bêîmkan bû. Qijika Belek di nav agirê evînê de bibû wek pepûkeke li ber diwaran.

Lê te digot qey Xwedê dîn û îman ji Kewa Gozel stendiye û ew kiriye dilkevirek, qet xema wê nebû. Çiqas Qijika Belek evîna xwe digot, Kewa Gozel wî qebûl nedikir û ew diêşand. Êdî roj ji bo Qijika Belek derbas nedibûn û her roj Qijika Belek di agirê evînê de diheliya. Ew bibû alav û agir û te digot qey wî hişê xwe xwariye û her roj li malê bê nan û av radiza.

Êdî sebra dîya Qijika Belek nemabû. Dîya wî ji mêrê xwe re got:

- Mêrik! Wiha nabe dilê min pê dişewite, kurê me her roj wek meyxweran digere û her roj dihele.

Bavê qijika belek gotê:

- Ez jî wekî te me evda Xwedê! Ka çi ji destê min tê. Ez jî halê kurê xwe dibînim lê ez dizanim tu tiştêkî ku em bikin tune ye. Em jî dizanin ku li vê dinê qaz bi qazan, baz bi bazan dike? Ma kî dîtiye kew bi qijikê re zewiciye? Ev tiştên ku kurê me dixwaze ne mumkîn e!

Lê mala dayikê bişewite, qet ferman guhdar nekir û got:

- Yan tu yê herî Kewa Gozel ji kurê min re bixwazî yan jî ez ê porê xwe kurr bikim û ez bi rêya xwe û tu bi rêya xwe. Bi vê hêrsê deriyê odê li pişt xwe girt û çû.

Bavê qijika belek mêrekî serjinik bû, ji derve ve gelek hişk xuya dikir lê di mal de jî ji jina xwe gelekî ditirsiya.

Wî nizanibû dê çi bike û ketibû di nav fikr û ramanên kûr û difikî ke gelo wê çawa xizmên xwe bo xwestina Kewa Gozel îqna bikira.

Jina wî ew gelek tirsandibû û ew jî mecbûr mabû, êvarê gazî rûspiyan kiribû û rewşa kurê xwe ji wan re şirove kiribû. Rûspiyan wan gava ku van gotinên bavê Qijika Belek dibihîstin bi cina diketin hemû mehdên xwe tirs dikirin û bibûn wekî barût. Gotin birin û anîn jê tiştêk beşer nekirin. Rûspiyan digot zewaceke bi vî rengî rabe. Piştî xeberdanên dûvdirêj û nerazibûnên rûspiyan apê Qijika Belek Jaro piçekî hêrs bû û wiha axivî:

- Eger hûn neçin Kewa Gozel ji biraziyê min re nexwazin, ez ê alikariya wî bikim ku Kewa Gozel birevîne û serê we têke belayê. Êdî bes e! Xwe ji kesekî kêmtir nebînin, em hemû evdên Xwedê ne, got û hinek ji axaftina xwe jî bi dilsozî û xeyalî domand.

Bi axaftina Jaro rûspiyan wan lê hatin rihmê, fikrê wan jî guherî. Biryar dan ku herin xwazgîniya Kewa Gozel. Piştî ku Qijika Bwelek ev xweşxeber bihîst wextî jî şabûnan bifiriya. Êdî malbata Qijika Belek amadehiyên xwe kiribûn ji bo ku biçin xwazgîniya Kewa Gozel. Mezinên wan ketibûn pêşî biçûkêd wan dabûn pey wan..

Malbata Qijika Belek nizanibûn ku mêvanên wan ji ber çi tiştî hatibûn derketibûn ber derê wan. Bavê Kewa Gozel bang li keça xwe kir:

- "Keça min! Ew kî ne hatine?" jê pirsî. Bi bang kirina xwe re jî ber bi derî ve hat û ew jî wek keça xwe matmayî ma. Kewa Gozel dît ku bavê wê hat, ji paş ve vekişiya û kete

hindir. Bozo silav da bavê Kewa Gozel, Bavê Kewa Gozel silava Bozo girt lê wî hê jî tu tişt fêhm nekiribû.

Qijika Belek xwe zehf xweşik kiribû û bejn û bala wî jî lihevhatî bû. Lêbelê te digot qey çavên Kewa Gozel korbûne û vê xweşikbûna Qijika Belek nedidît hema binê çavan re be jî silavek nedidayê. Piştî kurtedemekî bavê Kewa Gozel ew keremî hundir kirin. Giş çûn di odeya mêvanan de rûniştin. Piştî demeke kurt apê Qijika Belek dests bi xeberdanê kir:

- Biraye ezîz! Em ji bo keça te ji kurê xwe re bixwazin û bibin xizmên hev, hatine.

Lê hê gotinên Bozo neqediya bûn diya Kewa Gozel wisa kir ku mêvanan rêya xwe şaşkirin û revî revî ji mala wan derketin. Heqaretên diya Kewa Gozel qet ne yê qebûl kirinê bûn. Wê tiştên ne bihîstî ji wan re got. Gotinên diya Kewa Gozel wisa bûn ku zora Kewa Gozel jî çûbû. Kewa Gozel her

çiqaş dilkevirek bû jî wê jî ew heqaretan kebûl nedikir. Wê ji ber gotinên diya xwe şerm kir û serê xwe di ber xwe de xwar kir. Kewa Gozel ji hemû kiryarên xwe poşman bibû û diya wê jî her çibû mesele xerabtir kiribû.

Piştî ku Qijika Belek malbata xwe û mezinên xwe di wê halê perîşan û pejmûrde de dît, ji xwe û ji evîndariya xwe kolîpoşman vegeyriya. Fikrên Qijika Belek demildest guherîbûn û di dilê xwe de digot:

- Min çawa ji yeke wisa hez kir?

Qijika Belek êdî xwe îqna kiribû dê dev ji Kewa Gozel berdaya. Lê Kewa Gozel hat ku li ser navê diya xwe lêborîne bixwaze û bibêje êdî ez jî ji te hez dikim. Gava ku Qijika Belek Kewa Gozel dît dîsa weke rojên serî dilê wî agir pê ket û şewitî. Kewa Gozel got:

- Ez dizanim diya min dilê te û malbata te gelek şikandiye, lewma jî ez ji te û malbata te lêborîne dixwazim. Ez êdî wek berê nîn im.

Qijika Belek tiştêkî wiha qet ji wê hêvî nedikir. Lewma hinekî şaşwazî mabû. Nizanibû wê jê re çi bibêje. Gotinên xwe di hişê xwe de berhev kir û xwest ku tiştêkî bi dilê xwe jê re bibêje. Piştî sekneke kurt got:

- Kewa Gozel, tu dizanî...

Gotina Qijika Belek di gewriya wî de ma. Ji nişkê ve cihê xwe veciniqî. Hê matmayîna xewa ecêb ji ser xwe neavêtibû qêrîna bavê xwe bihîst:

- Qeşmerê kurê qeşmeran. Ez ji serê sibehê de li serê zeviyê mir im, tu hatiyî li bin darê kêfa gurê manço dikî. Qijika Belek hê jî tu tiştî fêhm nekiribû. Ji wî wetrê evîna wî û Kewa Gozel ne xewn bû. Qijika Belek aliyek ji bavê xwe direviya aliyek jî digot xwezila min bersiva Kewa Gozel bidayê.

TENAYÎYE

Neslihan TEMEL

Serê yew masa de
Astorê xo nêro
Dima çima ti
Wextê biyê çilayê hiçem
Reyna tarî, reyna tenatî
Serê masa de astorê mi çî hana
Ruhê mi, qelbe mi reyna kot tarî
Ez reyna tena monawa
Serê yew masadî çî hana.

SEWTA MIRINÊ

Mem ARTEMÊT

Û wê nikaribin
Qurçimokên rûyê te veşêrin,
Ew awênayên ku
Bi salan dibişirîn rûyê te.
Û wê nikaribin
Te bigihînin çepera zarotiya te,
Bêhna xortaniya te,
Cendekê pêlistokên te,
Ew qidûmên di çokên te de mayî
Yên xapxapok,
Û yên bêpar ji rastiye.
Li min 'eyan e
Tu ye bikerî, biqicqicî, bixeniqî
Û wênayên rabirdûyeke pûç
Pêlî himêza xwe bikî
Bi hêsirên ferfûrî
Bi hewandinên derewîn.
Ez qasidê zemên im.
Wê dem bibe hespa herî lezgîn,
Wê melkemot bialêse
Çirkeçirkên demjimêra te,
Hemû hezkerinên dilê te,
Wextê deyn ê ku dabûne te...

Axx dilo yazixa wî 'emrî.
Zanim,
Wê te hembêz bike
Xweliyeke şil,
Kêleke rûtehl,
Goristaneke dilgîvêş,
Digel mirineke bêwext
Piştî koça payîzeke rengzîvîn
Piştî hatina cemse cemseyî
Ya wê zivistana krîstalî
Zanim,
Ji lew ez malxweyîye axa sar im
Û bir neke haa rêwiyo!
Wê nikaribin te xelas bikin,
Wê nikaribin,
Wê nikaribin...

11 11 2014 Cewlîg



NÛR ELÎ ÎLAHÎ

(OSTAD ELAHI)

Wekî ku hûn jî dizanin dema şerê Cihanê yê yekemîn diqede, dewletên emperyalîst li gorî menfeatên xwe sînoran xêz dikin. Wê demê yê ku herî zêde mexdûr dibe mîletê Kurd e. Axa me tê dagirkirin û welatê me ji aliyê çar dewletan ve tê parvekirin. Ji bo ku em ji hev dûr bikevin û têtîliya me bi hev re çênebe, bi têtîl û mayinan jî axa me kurdan, tê dorpeçkirin. Ji ber van sedeman Kurd ne tenê li van dewletan lê li hemû cihanê belav bûn. Rewşenbîrên me, ronakbîrên me nivîskarên me, muzîsyenên me û helbestvanên me jî belav bûn. Ew bi eslê xwe Kurd bûn lê mixabin bê dewlet bûn. Ji ber van sedeman bi gelemperî ev mirov wek Tirk, Faris û Ereb dihatin naskirin. Ev nîrxên me ji xeynî me kurdan jî aliyê hemû dinyayê ve dihatin naskirin.

Yek ji van mirovan jî Nûr Elî Îlahî ye ku bi eslê xwe kurd e lê ji ber ku li Îranê ji dayîk bûye mixabin hemû dinyayê wî wek Faris nas kiriyê.

Nûr Elî Îlahî, ku muzîsyenekî pir navdar e bi navê Ostad Îlahî li hemû Cihanê belav bûye. Hemû cihan li wan kilamên wî yê resen û bêhempa guhdar kirine û cihêkî gelek giring jê re veqetandine. Gelê Ewropayê nîrxêke mezin dane fikir



Hesenê CINDÎ

û ramanên wî û gelek xebat li ser muzîka wî kirine.

Malbata Rewşenbîrê Kurd Nûr Elî Îlahî

Nûr Elî Îlahî di 11ê Îlona 1895an de li Rojhilata Kurdistanê li gundê Ceyhûnabada Kirmaşanê ji dayîk bûye û li bajarê Tehranê di sala 1974an de çûye dilovaniya Xwedê. Gora wî jî nika li Tehranê ye. Îlahî, endamê malabateke bi hêz ya kurdên yaresan e. Navê bavê wî Hecî Nîmet Kakayî ye. Hecî Nîmet şewirmendê walî bû, lê ji ber fikirê xwe yî mîstîk û ruhanî dev ji karê xwe berdide û dikeve înzîvayê. Lê ji xeynî înzîvaya xwe ji bo perwerdekirina zarokên xwe dixebite. Lewra ew giringiyeke mezin dide zarokên xwe nemaze jî dide Nûr Elî. Jixwe dema ku mirov li jiyana Îlahî dinêre bi hêsanî bandora bavê wî diyar dibe.

Xwişkeke wî ya bi navê Melek Can Nemat ku gelê kurd jê re dibêjin Ezîze Canê jî heye. Gelê Ewropa nîrxêke mezin dide fikir û ramanên wê û wê wek Ezîze Teresa bi nav dikin. Li ser navê wê li bajarê Baillouya Fransayê bîrdarek tê çêkirin.

Pirtûkeke bavê wî ya bi navê “Şahên Heqîqetê” heye. Ev pirtûk ji aliyê Henri Corbin ve hatiye weregerandin ji bo fransîzî. Corbin, ji bo giringiya vê pirtûkê dibêje “eynê wekî Încîlê ye”.

Îlahî, di şeş saliya xwe de dest bi tenbûrê dîke û di neh saliya xwe de dibe hosteyê tenbûrê. Lê ne tenê tenbûrê perwerdehiya xwe ya dibistanê jî didomîne. Her wiha ji aliyê bavê xwe ve dîsîplîneke ruhanî û dersên olî jî distîne.



Ostad Îlahî
bi tenbûra xwe re

Dadgeriya Wî

Dema Îlahî xwendina xwe ya dadgeriyê distîne, li Îranê nûjenkirina hîmên dadmendiya welêt pêk tê. Wê demê Îlahî xwendina xwe ya sê salan di şeş mehan de diqedîne û di sala 1934an de bi awayekî bêhempa destûrnameya dadgeriyê werdigire. Îlahî 23 salan karê dadgeriyê li gelek cî û deverên Îranê didomîne û di sala 1957an de teqawit dibe û li Tehranê bicih dibe. Îlahî dema ku dadgeriyê dîke, li ser mafên jin û mêran û wekhevîyê jî xebatan dîke û pê re jî dev ji filozofî û muzîkê jî bernade.

Fîlozofiya Wî

Îlahî, fîlozofekî kurd e. Hemû دنیا filozofîtiya wî dipejirîne. Fikir û ramanên wî gelekî bandor li ser mirovan kiriye. Ostad Îlahî hemû olan dinasî û qîmeteke mezin dida wan. Li gorî baweriya Îlahî hemû ol yek in û danasina Xwedê ne. Ji ber vê yekê divê olên cuda bi hev re nekevin şer û gengeşiyê, divê di navbera wan de xweşbînî û piştgirî hebe. Dîsa li ser rîya kamilbûnê jî xebitî ye û gotiye eger mirovek bixwaze bibe yekî/ê

kamil, divê “tiştên ku ji bo xwe nexwaze divê ji bo mirovên din jî nexwaze”.

Li gorî Îlahî manewiyat ne tevgerêke li gorî zanist û aqil e. Ji ber vê yekê mirov bi rîya ceribandîne, tiştên baş û nebaş fahm dîke û ev tişt jî mirovan di rîya kamilbûnê de bi pêş dixê.

Îlahî li ser mijara hebûn û tunebûnê zehf rawestiyaye, her dem li pey şopa wateya jîyanê geriyaye. Lewra li gorî fikra wî pêşîya her tiştî, divê mirov dest bi fehma jîyanê bike û li ser vê tegihîştîne, jîyana xwe ava bike. Bi vî awayî mirov jîyana xwe tam werdigire.

Îlahî qîmeteke mezin daye tiştên mîstîk, metafîzîk û tesawûfê, li ser wan tiştan gelek lêkolîn kiriye û gelek pirtûk nivîsandîye. Şeş berhemên wî hene¹ ;

1. Bûrhanul Heq
2. Marîfetil Ruh
3. Sed Gotin
4. Peyvên Heqiyê-1
5. Peyvên Heqiyê-2
6. Haşiyeya Şahê Heqîqetê (a bavê wî)

Ji xeynî van pirtûkên çapkirî berhemek wî heye tê de ku şîroveya Quranê kiriye. Giringiya vê berhemê ev e ku şîroveya wê bi zimanê kurdî hatiye kirin.

Ji navê berhemên wî tê fahmkirin ku li ser mijarên tesawufî û mîstîk pir rawestiya ye. Lewra wî bingeha fikir û ramanên xwe jî bavê xwe stendiye. Îlahî pir di bin bandora bavê xwe de maye. Ji xwe çavkaniya fikir û ramanên wî ji Kakayîtiyê (Ehlê Heq) tê.

¹ Mihemed Ronahî, Ostad Elahî (1895-1974) : <http://www.haberdiyarbakir.com/ostad-elahi-1895-1974-20604h/>

Tenbûra Wî

Me di serî de got Îlahî hosteyê tenbûrê ye. Ji şeş saliya xwe dest pê dike û heta dawîya temenê xwe li tenbûrê dide. Dengê tenbûra wî dengêkî bêhempa bûye, ew li ser tenbûrê xebitiye û teknîkên nû saz kiriye. Teknîka wî ya herî balkêş ew e ku, dema ku li tenbûrê dide deh tiliyan bi hev re bikar tîne. Bi awayekî tenbûrê nûjen kiriye.

Muzîk, melodî û helbestên wî yê mîstîk li ser şopa kevnare dimeşe. Giringiya muzîka Îlahî ew e ku, ew bi tenbûra xwe caz dike û dengê tenbûrê wek medîstasyonê bi kar tîne. Ew di muzîka xwe de, di bin bandora çanda Rohhilata Navîn û Kafkasyayê de ma ye.

Ji bo muzîka Îlahî tişteki balkêş heye ew jî ev e ku, Nûr Îlahî di jiyana xwe de qet konser nedaye. Tenê li civatake biçûk di nav nas û dostên xwe de li tenbûrê daye. Ev dengê tenbûra wî jî ne bi awayekî profesyonel hatiye tomarkirin tenê ev deng jî aliyê guhdarvan û dostên wî ve hatiye tomarkirin. Bi vî awayî dengê tenbûra wî gihîştîye roja me. Dengê tenbûra wî wisa resen û rewanbêj e ku mirovan heyranî xwe dihêle.

Gelê Ewropayê heyranî dengê tenbûra wî bûne û wî wek Mozartê duyem an jî Mozartê nûjen dîtine. Dengê muzîka wî û ya Mozart dane ber hev.

Îlahî di warê muzîkê de xwe gelekî bi pêş xistiye. Ew di qada muzîkê de wiha bipêş dikeve ku UNESCO muzîka wî dixê bin parastina çandî û muzîka wî wekî mirata çanda cihanê dipejirîne.

Îlahî li Ewropayê gelekî tê hezkirin, ji ber vê yekê li Fransayê bi navê “Weqfa Ostad Îlahî” weqfek heye ku ji aliyê kurê

wî Behram Îlahî ve hatiye avakirin. Di sala 1995an da ji ber sedema rojbûna wî ya sedemîn de ji aliye UNESCO, Wezaretê Çandî û Zankoya Sorbonnê ve sempozyûmek hatiye li dar xistin.

Ji xeynî van agahiyan li Amerîkayê li ser Ostad Îlahî pêşangehek² vedibe, giringiya vê pêşangehê ev e ku li Amerîkayê cara yekem pêşangeha yekî Îranî vedibe lê mixabin ne bi nasnameya wî ya kurd ve.

Encam

Bi dehan kurdên wekî rewşenbîrên kurd yê wekî Îlahî hene ku hemû dinya li ser wan dixebitin, bi dehan konferansan li dar dixin, gotaran dinivîsin, pirtûkan çap dikin, li ser navên wan pêşangehan, navendên çandî vedikin lê em kurd jî van tiştan bêxeber in. Ez hêvî dikim ku wê rojekê qedr û qîmeta mirovên wiha ji aliyê kurdan ve bê zanîn. Ez hêvîdar im ku ev nivîs ji aliyê danasîna Nûr Elî Îlahî ve ji we re bibe wek mînakê.

Herî dawî jî ez dîxwazîm tişteki wisa bibêjim ku ne tenê kesê xwediyê guhê muzîkê ye, an kesê denge tenbûrê hez dike, herkes, bi hêsanî dikare li ser internetê dengê tenbûra Îlahî ya zelal û narîn, peyda bike³. Her şad û bextewar bin.

Çavkanî

1. www.ostadelahi.com
2. Mihemed Ronahî – info@haberdîyarbakir.com
3. Celîl Demîralp – Yeni Özgür Politika 27 Sibat 2007
4. Wîkîpediya: http://ku.wikipedia.org/wiki/Nûr_Elî_Îlahî

2 - Muzeya Metropolitan a Hûnerê

2 - Hûn dikarin li ser vê linkê guhdariya dengê tenbûra Îlahî bikin: <http://www.ostadradio.com/>

Kürdistan Kartal Yado

Kamiran Alî Bedîrxan & Herbert Oertel



KÛRDÎSTAN KARTALI YADO

Şukrî ŞEMZÎNAN

Jiyana Nivîskar

Elî Bedîrxan
parêzer û
rojnamevanekî
kurd e. Ew
ji malbata
Bedîrxaniyan
e. Kamiran Elî
Bedîrxan birayê
Celadet û Sûreyya

ye. Di 21ê tebaxa 1895an de li Stenbolê hatiye dinyayê. Li zanîngeha Stenbolê hiqûq xwendiyê û paşê li Almanyayê doktoraya xwe ya hiqûqê qedandiyê. Paşê li Bêyrûdê bi cih bûye û li wir parêzeriyê kiriye.

Gelek nivîs û wergerên wî di kovara Hawarê de hatine weşandin. Kamiran Alî Bedîrxan li ser edebiyata Kurdî gelek xebatên giring kiriye. Yek ji wan xebatan jî pirtûka Kürdistan Kartalî Yado ye. Kamiran Alî Bedîrxan ev romana bi Herbert Oertel re bi almanî nivîsiye. Kitap ji aliyê Îlhamî Yazgan ve ji almanî hatiye wergeran bo tirkî. Kitap di sala 2014an de ji aliyê Weşanên Avestayê ve hatiye çapkirin. Em ê di vê nivîsa biçûk da hewl bikin ku pirtûkê bi awayekî serveyî binirxînin.

Kurteya Çîrokê

Di çîrokê de lehengên sereke Yado û hevalê wî Ramo ye. Yado li deverên curbecur ên Kurdistanê, li hemberî hikumeta Tirkan, serokatiya şoreşê dike. Yado û hevalên wî şoreşa xwe carinan li nav bajaran, carcaran

ji li ser çiyayên Kurdistanê didomînin. Dewleta Tirkîyeyê jî dixwaze ku wî ji vê armancê bizivirîne. Ji ber vê li hemberî Yado û hevalên wî herdem êrîşan pêk tîne. Lê belê nikarin wî desteser bikin an jî bikujin. Yado di berxwedana xwe de her çiqas zehmetiyan bibîne jî ji armanca xwe venagere. Mebesta Yado ew bû ku gelê Kurd ji bindestiya dijmin xilas bike û ji Kurdan re jiyanekê azad ava bike. Bi vê armancê bi hevalên xwe re pîlanên êrîşan amade dike û pêşî jî êrîşê bi ser bajarê Mûşê dibe. Di berxwedan û serhildaniya Mûşê de bi ser dikevin. Lê belê serkeftina wan ewqas berdewam nake û ji ber bê piştgiriyê di êrîşeke giran de Yado birîndar dikeve û nagihîje armanca xwe. Têkoşîn û serhildan têk diçe. Yado ji ber ku ewqas sav û tirs berdaye hûndirê dilê Tirkan naxwaze Tirk ji bîr bikin û piştire bibêjin; em bi temamî ji Yado û serhildana wî xelas bûn. Ji ber vê yekê, Yado li ber mirinê ji hevalên xwe dixwaze ku, serê wî jê bikin ku Tirk nizanibin ew miriye da ku tirs min herdem di dilê dijmin de bimîne.

Taybetmendiya Lehengên Sereke

- Yado

Çîrok li ser Yado ava bûye û lehengê serekî ye. Yado di ji aliye kesayetîya xwe de mirovekî pir mêrxas û jêhatî ye. Li hemberê dijmin herdem serbilind e û ji hêla tevgerên xwe, her tim tirs xistiye dilê dijmin. Bi çanda xwe ve girêdayî ye. Dema ku li bûyerekê rûbirû dimîne biryarê li gor 'edet û toreyên gelê xwe dide. Ceng çiqas giran bibe jî bi

ehlaqî rêveberiyê dike û di şer de li hemberî dijminê xwe, çiqas hêrs bibe jî zordarî û neheqiyê nake. Hin caran leşkeran dil digire lê belê miameleyên baş li wan dike. Çimkî mebesta wî ne kuştin e, armanca Yado ew e ku, gelê Kurd, ji bindestiya dewletên biyaniyan xelas bike û kurdan bike neteweke serbixwe û azad.

- Remo

Di vê pirtûkê de bûyer ji devê Remo tê gotin. Remo pêşiyê li bajarekî dixwîne ku navê wî bajarî ji aliyê vebêjer ve nayê gotin û di demek şûn de vedigere welatê xwe. Remo bi saya apê xwe ji şoreşa Yado agahdar dibe û tev li şoreş û tevgerê dibe. Remo ji bo şoreşê kedekê mezin dide û gelek zehmetiyan dibîne. Remo ji serî heta dawî

hemû bûyerê bi zimanek herikbar rave dike. Di dawiya şoreşê de Remo û hevalek wî tenê dimînin, yên din jî tev tèn kuştin.

Cihê Bûyerê

Bûyer bi gelemperî li ser çiyayên Kurdistanê, bi taybetî jî li ser çiyayên Agirî û derdora çiyayên Mûşê derbas dibe.

Peyama Çîrokê

Di vê romanê de xuya dibe ku kurd, çiqas hesreta welatekî azad dikêşin û ji bo vê daxwazê çiqas hewl didin. Her wiha ev pirtûk, edet û toreyên Kurdan jî dide li ber çavan. Wek mînak; Yado di tevgerên xwe de û rewşa ku tê de ye qet zordariyê nake û berxwedana xwe û biryarên xwe li gorî 'edalet', 'edet û toreyên kurdan dide. Her wiha di vê çîrokê de tê xuyakirin ku Kurd çiqas mêvanperwer in. Kurd heke mêvanek bê mala wan ew kî dibe bila bibe wî/ê wek xwediyê malê dihesibînin û xizmeta mêvanên xwe dikin. Di vê pirtûkê de ew peyama ku nivîskar dixwaze bide gel bi mînakên rastiyê ve girê dide. Di vê pirtûkê de Kamiran Alî Bedirxan giringiyê dide jinan û jin di qadeke pir bilind de ne. Ji bo mînak jin dikare rêveberiyê bike û li hemberî dijmin erîş û şer bike. Jinên kurd li hemberî dijminan serê xwe tu caran natewînin. Ji bo vê gotinê em dikarin diya Atmani bînin bîra xwe. Dema ku dijmin Atmani dikûjin û laşê wî tînin hundirê gund pişt re hemû gundiyan top dikin, li ber çavên diya wî şkenceyê li Atmanî dikin da ku çavên kurdan bitirsînin. Lê belê her çiqas dilê diya Atmani ji bo zarokê xwe bişewite jî ji bo ku dijmin bi vê bûyerê şa nebin yek hêsr jî ji çavên xwe bernade. Kurd li hemberî dijminan herdem li gorî edaletê tevdigerin, neheqî li dijmin nakin û li gorî adet û toreyên xwe biryaran didin.



Dr. Kamiran Alî Bedirxan

ZIWAN

Şahap LAÇÍN

Ziwanê ma, ma rê zaf weş o
Ma rê sey şerbetî şîrin o
Çi heyf ke ziwanê ma kêmi beno
Rojbi roj ziwanê ma kêmi beno

Şarê ma hişar re ziwan de xo nîyo
Ziwanê ma binê ziwanan de şarî do
Şarê ma wayîrî ziwan de xo nêkeno
Hêdî hêdî zîwanê ma vînî beno

Welatê ma bindestîya şarî do
Cayê ma xoser ma dest nîyo
Zîwanê mazey verî qalî nêbeno
Gam bi game zîwanê ma vînî beno

Dinya sey dinyaya verêne nîya vurîyaya
Şar zî zey şaranê verênan nîyo bedilyayo
Zîwanê ma bedilyayo coka tepîya mendo
Ma zî bivurîyê ziwan de xo rê wayîr

WWW.MMM

WWW.MMM

EZ Ê ZIMÊN BIKUJIM!

Tufan YAMAÇ

Gelo dibe ku qesta me ji “zimanê akademîk”, “zimanê taybet” an jî “zimanê qadekî” be? Helbet dibe! Zimanê kurdî her çiqas di nav pişaftinê de bigevize jî îro vejîna wî jî di destê me de ye. Îcar em ê zimanekî nû “çêkin” an zimanê kurdî bi nasnameya wî ya resen “biparêzin”? Divê di vê mijarê de pirsnişanek bê dayîn û bersiva wî jî “kurd” bidin. Lê pirsgirêkek di vir de dest pê dike. Gelo kîjan “kurd”?

Ehmedê Xanî, dema ku di sedsala 17an de ji bo Mem û Zîna “gel” hibra pê nûsa xwe dirijîne; carinan hibra pê nûsa wî rengê farisî, carinan rengê erebî û carinan jî rengê tirkî digire. Belê, Ehmedê Xanî ev “berhema gel” bi keskesora zimanan digihîne hev. Ango di vê berhema Ehmedê Xanî de gelek peyvên biyanî (farisî, erebî, tirkî û hwd.) hene lê îro ev berhema Xanî, ji aliyê Farisan ve jî, ji aliyê Tirkan

ve jî berhemeke “kurdî” tê hesibandin. Lewra peyvên biyanî nikarin vê berheme ji kurdî derxin. Xaleke din jî, heke em Mem û Zîn û berhemeke wêjeya kurdî ya nûjen bidin ber hev, wê Mem û Zîn ji aliyê kurdiyeke “ne xwerû” ve derkeve pêşiya me. Lê wêje, bi saya gel tiştêkî tecrûbe kiriye ku ew jî “rexneya gel” e. Gel, dema ku di berhemeke de tiştêkî aîdê xwe nebîne, wê berheme naxwîne û nan û avê jî nade wê û nivîskarê wê. Wê demê berheme û nivîskarê wê



ber bi mirinê ve diçin û êdî dikevin gora demê. Îcar ku gel di berhemekê de “xwe” bibîne, wê demê xwedî li wê û nivîskarên wê berhemê derdikeve û ew berhem dibe berhemeke temendirêj. Mînakên herî baş jî di wêjeya klasîk a kurdî de tên dîtin. Çima îro hê jî nivîskarên klasîk ên wekî Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Fekiyê Teyran û hwd. tên xwendin? Helbet ev xwedî derketina gel e. Gel ji wan hez dike û wan di nav xwe de dihewîne. Lewra pênuşa van kesan tenê pênuşeke şexsî nîn e. Pênuşekî “gelî” ye jî. Belê, temenê Mem û Zînê bi sedan sal e lê gel dikare berhemeke “xwerû” di navbera çend salan de jî bikuje.

Meseleya ziman jî tiştêkî wek Mem û Zînê ye. Dibe ku kesek li hemberê Mem û Zînê berhemeke populîst a temenkurt derxe. Karekî xeternak e. Di encamê de an ziman dimire, an jî fikir.

Dema ku mirov dinêre, ziman wek çemekî xuya dike. Ava vî çemî hîç nasekine û bi taybetî jî di nav globalîzma dinyayê de ava wî diherike. Ev çem, di nav ava xwe de masiyên cuda cuda dihewîne. Lê dema ku mirovên îroyîn ji çemê hezar salî re bêjin “Ava vî çemî li boşê diçe, em ê santrala hîdroelektrîkê li ser vî çemî çêkin”. Wê pêşiya çem bê girtin, wê masiyên wî çemî yek bi yek bimirin û wê sirûştê çem jî xera bibe. Dê ev çem çawa di nav axa gelê xwe de biherike û ev gel wê çawa goştê masiyên çemê xwe bixwe?

Li aliyekî jî navê kurdî jî kurdan tê. Lewra jê re kurdî tê gotin. Îcar zimanê ku kurd neaxivin dibe ku navê wî kurdî be? Ez bawer im jî bo me hemûyan bersiva vê pirsê “Na!” ye.

Kurdî îro hêdî hêdî nasnameya xwe ya resen dinase lê pirsgirêkeke li ser “zimên” jî heye. Gelo em bê destûra gelê kurd dikarin bi kurdî bilîzin? Ji bo guherîna kurdî çi bê

xwestin, divê bi “destnîşana gel” têkeve piyaseyê.

Ger em bixwazin nasnameya kurdî binasin, ev nasname di berîka gelê me de ye. Gel, ev nasnameya xwe venaşêre. Helbet nasnameya her kesî şexsî ye û ji her kesî jî cudatir e. Lê divê mirov dema ku nasnameya hevpar mêze bike, bi nasnameya şexsê xwe re nede ber hev. Lewra dibe ku mirov di nasnameya gel de mînakek ji nasnameya xwe nebîne.

Îro dîrok jî şahîd e ku tiştên ku gel qebûl neke nikare bijî. Dibe ku ev serokê dewletekê be jî û dibe ku ev berhemeke “xwerû” be jî. Mirovên ku guh nedin gel, gel guhê wan dikşîne û mirovên ku zimanê gel xera bikin gel jî wek bersiveke wêjeyî “zimanê wan” jê dike.

Zirara peyvên biyanî ji zimanê kurdî re tune. Lewra ev peyv êdî ketine nav zimanê vî gelî. Dibe ku rêberên zimanê kurdî van peyvên biyanî bixwazin ji zimanê kurdî derxin û bêjin “zimanê resen”. Lê îro zimanê resen mimkin nîne. Ne ji diwariyê, ji sirûştê ziman mimkin nîne. Lewra ziman tiştêkî dînamîk û her tim peyvên nû digire. Îcar peyvên ne bi kurdî bin dê gel van peyvên bi kar neyîne? Na, ziman tiştêkî wisa ye ku ji bo îfadekirina tiştêkî, peyv jê re pêwîst be, ji peyvên “biyanî” re jî xwedî derdikeve û wan jî hembêz dike. Her ziman heta astekê dikarin “xwerû” bimînin. Jixwe forma her zimanî cuda ye û reseniya ziman jî ev e. Ferz nîn e ku em îro ji televîzyonê re an jî ji telefonê re navekî “kurdî” bibînin. Erê, peyvên televîzyon û telefon ji frensî, ango ji Frensayê hatine. Lê hatine ku derê? Hatine kurdî û Kurdistanê! Îcar van peyvên her çiqas frensî bin jî ew qas Kurdistanî ne. Hewce nake ku mirov zimanê xwe bikuje.

ÇI PAWENÎ?

W. K. Merdimîn

Çendêk bena wa xeyrin bo, wazen' wa zerd û sîmin bo
 Gama ke zad û werd çin bo, dêze w' xil ra çî pawenî!
 Derd û kulan bêhiş kerdo, vera darû jehri werdo
 Awe ame arê berdo, purt û pil ra çî pawenî!
 Zanîyan de derman çin bo, qelbê ma de îman çin bo
 Hêga de randiman çin bo, pişk û sil ra çî pawenî!
 Camêrdo ke bêwahar bo, ha peye bo, ha suwar bo
 Eke ristim wişk û war bo, pel û gil ra çî pawenî!
 Homayî ra çî ke bêro, qiymetê ey hemin ser o
 Zanayey' ma hewna şêro, ti cahil ra çî pawenî!
 Qey ti eşkera nêvanî, hîşê tayên sere n'anî
 Gulistan bi sey zindanî, gul û vil ra çî pawenî!
 Wayir ziwan ewam û xas, qey nêtehmnen' kird û kirdas
 Vîndî bîyo durr û elmas, ti çaxil ra çî pawenî!
 Tayên qedik, tayên kirbas, piragirewt tayên atlas
 Qiymet çin o çend û çiqas, belg û cil ra çî pawenî!
 Merdimîn ti erey kewtî, bîy têmîyan raşt û çewtî
 Peynî d' ba'sû ba'de'l-mewtî, ti xafil ra çî pawenî!

BER-BENDÎ

Kerem CAN

Di hûndirê xwe de
Xewnan xwedî bikim
Ji bo te delaliyê
Ji jana te jî qayil im
Tenê tu meçe

**

Wê dengê min winda bibe li newalekê
Ez ê parî parî bibim bi dûrîtiya te
Lê ez ê nemirim,
Şêntir bibim bi hêviya te.
Tenê tu meçe...

**

Ji lêvên te ramûsan naxwazim
Wê awirên te têra min bike
Tenê tu meçe

**

Di wextên kambax de
Mîn bê dil nehêle
Wê di çeman de bixeniqin heviyên min
Lê ez ê nemirim
Zîndîtir bibim li benda te
Ji êşa te jî razî me
Ji xema te re jî
Tenê tu meçe.

ÎŞEV

Erol ÇOBAN

Xeyidîm dîsa, ji vê şevê Çavên min li te digerin
Ji ber nebûna te Bi hêvîyeke xweş
Û ji ber tenêtiya xwe. Bi dilekî safî
Bi hev ketin hiş û dilê min Û bi çavên paqijane.
Û rexne dikin hev û yên din, Nuqmî bédengiyê bûme
Wekî dijminekî. Di nav xeyalên te de
Pişt re jî, li hev hatin Û pişt re jî...
Û êrîşên min dikin, Dikevim nav xeweke
Bêmerhametî. Kurdiyane
Digerin dîsa Wekî çavên te yên xweşik
Û masûmane..




Laser

KEDKARÊN VÊ HÊJMARÊ KEDKARANÊ NA HUMARE

Xwendekarên Zanîngeha Çewlîgê

Ahmet Subaşı, Sinif:2, Beş: Kurmancî
 Berfok Kendal, Sinif:2, Beş: Zazakî
 Ejder Êlih, Sinif:2, Beş: Kurmancî
 Erol Çoban, Sinif:2, Beş: Kurmancî
 Fatma Oktay, Sinif:2, Beş: Kurmancî
 Haşem Tilkî, Sinif:2, Beş: Kurmancî
 Hesenê Cindî, Sinif:2, Beş: Kurmancî
 Kerem Can, Sinif:1, Beş: Kurmancî
 Kübra Öztürkeri, Sinif:2, Beş: Kurmancî

Mazlum Şemzînî, Sinif:2, Beş: Kurmancî
 Mem Artemêt, Sinif:2, Beş: Kurmancî
 Neslîhan Temel, Sinif:2, Beş: Zazakî
 Şahap Laçîn, Sinif:2, Beş: Zazakî
 Şukrî Şemzînan, Sinif:2, Beş: Kurmancî
 Tufan Yamaç, Sinif:2, Beş: Kurmancî
 Zeynep Yıldız, Sinif:1, Beş: Kurmancî
 Zübeyr Durmaz, Sinif:2, Beş: Kurmancî



**Kurdno,
malxerabno,
an nebêjin
em Kurd in,
an jî bi Kurdî
bixwînin,
binivîsin
û biaxivin.**

Celedat Elî Bedirxan



Ji Çalakiya Klûba Ziman û Edebiyatê, Zanîngeha Çewlîgê
Aktîvîteyê Klûba Ziwan û Edebiyatê ra, Unîversîteya Çewlîgê





Dewa Goriz (Çevrimpar Köyü) Çewlig 1962 Foto-Ahmet Say